DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz


Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

## https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

- Telegram: https://t.me/birkitapbir
- WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y



# Mayakovskî

# Şiîrên Bijarte

NÛDEM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

**Mayakovskî** di 19'ê Tîrmeha 1893'an de hatiye dinyayê û di 14'ê Nîsana 1930'yî de jî xwe kuştiye. Ew li Rûsyayê yek ji serkêşên tevgera Futurîzmê bû, piştgirê partiya Bolşevîkan bû û hîmdarê şiîra nûjen bû. Mayakovskî di derheqa şiîr û şaîrtiyê de weha dibêje: *"Divê şiîr mîna biharê azad be, mîna çemekî bi xuşîn biherike, rast be û bi naveroka xwe mîna risasê be. Divê şaîr di jiyanê de jî serek be"*

Weşanxaneya me bawer e ku bi weşandina şiîrên vî şaîrê dinyayî, deriyekî nû li edebiyata kurdî vekiriye.

*"...*
*Ez,*
*yê ku di zîndanê de fêrî evîndariyê bûm*
*min li dengê daristana Boulogne guhdar nekir.*
*Min bêriya keserên evîndariyê*
*li dereke raserî dîmenên deryan nekir.*
*Ez,*
*yê ku li ber kulleka hucra sed û sisiyan*
*wilo bê westan radiwestiyam..."*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MAYAKOVSKÎ

# Şiîrên Bijarte

Wergera ji swêdî: Süleyman Demir

Weşanên NÛDEM

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Weşanên NÛDEM: 27
Şiîrên Bijarte
Çapa Yekem: Stockholm 1997

© Weşanên Nûdemê
Pergala bergê û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Fotografê Mayakovskî
ISBN: 91 88592-27 8

Adres: NÛDEM
Termov. 52, 2tr.
176 77 Järfälla-Sweden
Tel û Faks: 8-583 564 68

Bêî destûra Weşanên Nûdemê jinûveçapkirin, di kovar û rojnameyan de weşandin qedexe ye.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# NAVEROK

Pêşgotin 5

Bi kurtî li ser Mayakovskî 7

Qutikê tewtewan 24

Ewrekî bi şal 25

Civîn 51

Lîlî Can 53

Li ser wilo 56

Klama li ser zîndana Readîngê 59

Name ji Tatiana Jakovsleva re 116

Xatirxwestin 120

Heta deng hebe qîrîn 121

Notên dawî 128

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Pêşgotin

Berî niha bi çend salekî, min pirtûkeke Mayakovskî kirrî. Min kir dora pêşî û min zû xwend. Min du caran xwend. Min deverin jê gellek caran xwendin.

Min berê jî perçe ji helbestên wî xwendibûn, min navê wî bihîstibû. Lê çaxê ku ez li welêt bûm, him peydekirina pirtûkên wî sext bû û him jî pirr peyde nedibûn. Loma jî mixabin xwendin bi derengî, bi swêdî bû nesîbê min. Gava min xwendin, min him tameke edebî jê kir û him jî min bêhedan xwest wan wêneyên ku bi hunermendiya helbestan, bi peyv û dengan çêkiribûn, baştir bibînim. Min gellek jê dîtin. Bi min pirr balkêş hatin. Bêhempa bûn.

Min wî çaxî, xwest wê tama ku min jê kiribû, bi Kurdan re par vebikim. Min biryara wergerandina hinan ji wan da. Min bi dû re hejmara wan gellektir kır û ez bi nav agahdariyên di derheqa wî û hunerê wî de daketim. Îro, "gellek" tiştên wî bi Kurdî li ba min hene.

Sedema din a ku kir ez helbestên wî wergerînim Kurdî, vatiniyeke giran dida ber min. Gava ez çûm pirtûkxanê û min pirtûkên wî yên din jî deyn kirin, ez tê gihiştim ku helbestên wî bi piraniya zimanên dinyê hene. Lê bi Kurdî tune ne! Îro şêst heftê salên xelkê ku dixwînin, lê hîna bi zimanê me tune ne. Min ev yek li Kurdan wek heqeret û tade qebûl kır. Bi min giran hat. Min nikarîbû qebûl bikira. Min kir kar û da ber xwe. Loma jî ez bawer im ku bi weşandina van helbestan, ez îro, hinekî ji vê tada ku li Kurdan hatiye kirin radikim û hinekî ji vatiniya xwe pêk tînim.

Tê gotin ku Mayakovskî, yek ji wan kesên ku wergerandina berhemên wî sext e. Wergerandina helbestan bi xwe jî karekî ne hesan e. Tê gotin ku ji nû ve nivîsandina helbestan e. Ez di vê derheqê de bêdeng dimînim, lê divê ez bibêjim ku karekî ku xwêdanê û serêşê dixwaze ye.

Wergerandina helbestan bêqusûr ne gengaz e. Îllehî tiştinan ji



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

xwe wenda dikin. Bi piranî hêla helbestvanî sist dibe, melodiya dengan qels dibe. Lê gellek caran mane jî qels dibe. Carinan jî yek ji bo xelaskirina a din têk diçe. Lê çi dibe bila bibe, di wergerandina helbestan de, bêyî ku pîvanên bingehîn ên ku nivîsekê dikin helbest têk herin, mane tê parastin. Loma jî carinan aheng li ber çavên mirov, eşkere têk diçe, lê mirov dîsa jî bêmecal dimîne û nikare xelas bike. Kirina herduyan bi hevdû re bê qusûr ne gengaz e. Ev yek, ji ber newekheviya zimanan e. Deng û mantiqê zimanan ne wek hev in, li hev nayên. Qelsiyên wergêr, sedemeke din a vê encamê ye. Lê hin ziman dewlemendtir in, tîrtir in, mecalên pirtir didin karê afirandin û organîzekirina helbestan. Li gor lêkolînerên zimên, Rûsî mecalên pirr fireh dide helbestan. Mecalên guhertin û lihevdûqulipandina peyvan pirr in. Tîr e, musîkal e û bi hindik gotinan, gellek mane dıkare bê pêşkêşkirin. Jı bo tiştekî tenê, gellek peyvên paralêl dikarin hebin. Kîjan li hevokê bê, mirov dikare wê hilbijêre. Swêdî jî di gellek tiştan de wilo ye. Di warê nivîsandinê de, bi qasî ku bi edebiyata dinyê re be, bi pêş ve çûye. Ji bo hemû tiştan peyv hene, navên hemû tiştan hene. Lê mixabin antremana ku di warê edebiyatê de bi Kurdî bûye, hîna Kurdî negihandiye wê deverê. Di karê wergerê de, ev yek xwe dide pêş. Îcarê gava qelsiya mirov jî dikeve ser, ev yek dibe sextiyeke din û derdikeve ber mirov. Lê ji bo ku encameke baştirîn ji karê min derkeve, min hemû hêza xwe seferber kir.

Rêyeke ji bo ku qusûr di karên wilo de mînîmûm bin, wergerandina ji zimanê orîjînal e. Lê mixabin ez bi Rusî nizanim. Min xwest ez wan bidim ber Rûsî, lê ew mecal jî bi destê min neket. Divê ez wek agahdarî bibêjim ku min *Îşlikê tewtewan*, *Namê ji Tatîana Yakovleva* re, *Civîn, Heta deng hebe qîrîn* û *Xatirxwestin* ji swêdî wergerandin. Min hinek beşên *Heta deng hebe qîrîn*, ji wergereke din jî peyde kirin û dan ber hevdû. Min, *Li ser wilo*, ji swêdî wergerand û min da ber wergereke din a swêdî. Min *Ewrekî bi şal* û *Lîlî can* ji swêdî wergerandin û dan ber ên tirkî. Ez hêvîdar im ku wê ev berhem rojekê ji Rûsî jî bên wergerandin. Lê heta wî çaxî, bila ev helbest diyarî pirtûkxana Kurdan bin.

**Süleyman Demir**



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Bi kurtî Mayakovskî

Navê wî, Vladîmîr Vladîmîrovîç Mayakovskî ye. 19-ê tirmeha 1893-an li Gurcîstanê, li herêma bajarê Kûtaîsî, li gundê Bagdadî, ji malbateke Rus hatiye dinyê. Du xuşkên wî jî hebûn. Lûdmîlla û Olga. Dêya wî, Aleksandra Alekseyevna bû. Bavê wî Vladîmîr Konstantînovîç, karmendekî daristanê bû. Gava kaxet dirûtine, derzî di tiliya xwe rakiriye û xwîna wî pê bi jahr bûye, 1906-an pê miriye. Piştî mirina wî ne bi gellekî, malbat bar dike Moskovayê.

Hîna dema Mayakovskî xortekî pirr ciwan bû, li Gurcîstanê, bi alîkariya xuşka xwe ya mezin ferî raman û helwestên şoreşkerî dibe. Loma jî bala polisên Çar zû dikişîne ser xwe. Piştî ku bardikin Moskovayê, xurtir bi siyasetê mijûl dibe. Di dawiya sala 1907-an de bi Bolşevîkan re dikeve pêwendiyan û bi wana re dixebite. Li gora agahdariya ku ew bi xwe dide, endamê partiyêbû û di komîteya çapemeniya bidizî de dixebitî. Sala 1909-an sê caran tê girtin. Du carên pêşî tê berdan, lê cara dawîn teng tê girtin. Ji ber ku temenê wî biçûk bû, hew şeş mehan tenê di zîndana Butîrkî de dimîne.

Çileya pêşî sala 1910-an, piştî ku ji zîndanê derdikeve, pêwendiyên wî bi partiya wî re sist dibin û bala xwe dide wênevaniyê. Sala 1911-an dikeve akademiya wêne û heykel û dest bi xwendinê dike. Mayakovskî ew dibistan xelas nekir û nebû wênevanekî navdar, lê hêla wênevaniya wî ya ku hebû, heta mirina wî di jiyana wî de ma û bi awayekî amatorî jî be ji bo mirovatiyê xebitand.

## Destpêka helbestvaniya wî

Helbestvanî di jiyana Mayakovskî de kevntir e. Dema hîna xortekî nûhatî bû, bala wî çûbû ser helbestan. Him dinivîsîn û him jî bi kêfxweşî dixwendin. Lê di demeke kurt a xortaniya xwe de karê nivîsandina helbestan berdide. Ev sistî, heta destpêka xwendina wî ya wênevaniyê dom dike. Lê wê çaxê, bi yekî wek xwe helbestvan, bi David Burljuk re dibe



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

heval. Dema Bûrlyuk helbestên wî yên kevn dibîne, jê re `tu helbestvan î`, "ev başin" dibêje û daxwaz dike ku dîsa binivîse. Bûrlyuk dike ku di derheqa helbestvaniya wî de baweriyeke mezin li ba wî peyde bibe, dike ku xwe ji nû ve bi bawerî bide nivîsandina helbestan. Ji bo ku binivîse û birçî nemîne, Bûrlyuk her rojê 50 kopek pere jî didanê. Bi vî awayî dîsa dest bi nivîsandina helbest dike.

Her tişt jê û pê ve dest pê dike. Ew jiyana wek a gulekê kurt lê bi merxasî û bi rûmet, a ku seranser ji bo mirovatiyê bû kar û şer, bû kaniya berhemên giranbuha, a ku ji bo wî bi xwe bû evîndariyeke ku di şev û rojan hilnedihat, jê û pê ve dest pê dike.

Di destpêka helbestvaniya xwe de, di bin tesîra sembolîstan û Aleksandr Blok de dimîne. Lê zû xwe jê azad dike, stîla xwe ava dike û di warê ekola hunermendî de ciyê xwe peyde dike. Hîmekî ji hîmên ekola wî, tama jiyana xortanî û rabûna şoreşkeriya militanî bû. Ev yek her xuya dike.

Ji 1912-an pê ve, ew û hevalên xwe dest bi parastina rastiya Futurizmê -hunermendiya pêşerojê- dikin û 1913-1914 ji bo ku xwe û Futurizmê bidin naskirin, ew, Bûrlyuk û Kamenskî derdikevin turné; li meydan, dibistan, pirtûkxane û şanoyên gellek bajaran helbestên xwe dixwînin û propaganda dikin. Ji ber vê sedemê ew û Bûrlyuk ji dibistanê tên avêtin.

Mayakovskî wek helbestvan, bi helbesta xwe ya bi navê Ewrekî Bi Şal tê naskirin. Di dawiya 1914-an û serê 1915-an de nivîsiye û bi hinek sansurê çap kiriye.

Dema M. Gorkî cara yekem li helbestê guhdarî kiriye, gellekî pesinandiye û ji bo ku li welatê wî helbestvanekî wilo xurt derketiye, ji kêfan giriya ye. Ew hevdûdîtina pêşî bûye destpêka dostaniya wan a heta dawî. Hinek jî dibêjin ku gava Gorkî cara yekem lê guhdarî kiriye, tê derxistiye ku wê rojekê xwe bikuje, loma giriya ye.

Dema Mayakovskî û xuşka Lîlî ya biçûk Elsa (bi dû re bûye Elsa Trîolet, jina Louis Aragon) ji hevdû hez dikirin, ew û Lîlî buhara 1915-an çend caran hevdû dibînin, lê evîndariya wan bi dû re dest pê dike. Êvareke tirmeha 1915-an, bi Elsa re li mala Lîlî û mêrê wê Osîp dibe mêvan. Wê helbesta ku pê nav û deng dide, Ewrekî Bi Şal li ser xwestina



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Elsa, wê şevê ji wana re dixwîne.

Lîlî di derheqa wê şevê de wilo dinivîse: "...em bi dizî li ber Elsa geriyan: "Jê tika bike, bila nexwîne". Lê Elsa li me guhdarî nekir û me cara yekem li "Ewrekî Bi Şal" guhdar kir".

"...Mayakovskî li pêyan bû, piştа xwe dabû teniştа derî... wek ku li saloneke mezin bû, çavên xwe wilo hêdîka li odê digerandin. Piştî ku destpêka helbestê xwend, bi dengekî nerm ku tu caran ez nikarim ji bîra bikim - bi gotina rojane, ne bi helbestvanî- pirsî:

-Ma gelo hûn bawer in ku ev sergêjeka tayê ye? Ev bûbû. Ev li Odesa bûbû.

Me awirên xwe bilind kirin û heta ku ew berhema delal hemû hat xwendin, me nema karibû awirên xwe jê qut bikirana.

Mayakovskî her wilo bêliv rawestiyabû. Li tu kesan ne dinerî. Di nabêran de hinekî radiwestiya, gazin dikirin, qerf dikirin, bergerîn dikirin... îsyankar bû û bi xiroş bû.

...piştî wê jî li ser masê rûnişt û bi dengekî wek ê nalînê, çayê xwest. Min ecele li xwe kir û jê re çayê ji semawerê dagirt; ez bi xwe, devê min ji hevdû mabû û zimanê min ne digeriya.

Osîpê mêrê min, berî hemû kesan taqeta ku bikaribe dîsa li xwe vegere di bedena xwe de peyda kir. Qet bawer nedikir. Tiştekî wilo ne dîtibû. Heger Mayakovskî rêzeke din tenê jî nenivîsanda, em bawer bûn ku helbestvanekî mezin bû. (...) Osîp deftera Mayakovskî ji destên wî girt û nema bi paş de dayê. Tiştê ku me ji zû ve xeyal dikir û em li bendî bûn, ev bû. Wan demên dawî mirov nema dixwest tiştekî bixwîne. Helbestvanî di tengasiyê de bû -nivîskarekî xelet di derheqa tiştên şaş de, şaş dinivîsî û aniha, êdî ji nifşkê ve- yekî ku bi rastî nivîskar e, di derheqa tiştên rast de, rast dinivîse.

(...) Bi dû re Mayakovskî defter ji destê Osîp Maksimovîç girt, danî ser masê, rûpelê yekem vekir û ji min pirsî: 'Tu destûrê didî min ku ez helbestê diyarî te bikim?' û li jora helbestê, bidestnivîseke xweşik, wilo nivîsî: *Ji Bo Te Lîlî Juryevna Brik.*

Osîp Maksimovîç jê pirsî bê ma gelo wê helbest li ku bê çapkirin. Lê dema jê re hat gotin ku tu kes naxwaze çap bike, pirr aciz bû. Dîsa jê pirsî, gelo heger mirov bi xwe çap bike wê çiqase lê here?



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mayakovskî ji bo bersivê, bi lez çûbû çapxana nezîktirîn. Jê re gotibûn ku wê 150 rûble li hezarî herin û mirov dikare hemûyî bi carekê re nede. Osîp Maksîmovîç perên nifşê pêşî dan Mayakovskî û got ku wê ên din jî bi dû re peyde bike. Mayakovskî bi destnivîsê çûbû çapxanê".

Osîp, ne ku pere tenê dan Mayakovskî, her wilo xwe da ber berpirsyariya qanûnî jî û wek çapevan navê xwe li ser pırtûkê nivîsand. Loma jî li ser çapa yekemîn a Ewrekî Bi Şal, O.M.B. (Osîp Maksîmovîç Brîk) heye.

Çapa yekem, wek 1050 pirtûk çap bûye.

Lê wê êvarê, kêfxweşiya mezin, ne çapbûna pirtûkê bû, naskirina Lîlî bû.

## Mayakovskî, Lîlî û Osîp

Mayakovskî ji bo wê rojê "ew roj, dilgeşiyeke pirr mezin bû" dibêje.

Wê şevê li wir dev ji Elsa berdide, dildikeve Lîlî û heta roja ku xwe dikuje jî, wek wê bîstika pêşî dildarê wê dimîne.

Lîlî jineke ku hemû xusûsiyetên pîrekî lê hebûn bû û spehî bû, bi aqil bû û li gora demê çandeyar bû. Xwediya hêviyên bilind û xwestinên mezin bû, pîrekeke şareza bû. Lê carinan dikarîbû di dereca zalimiyê de pêl kesên li dora xwe bike, li ber a xwe be û dilkevir be. Li gora ku pirr ji Mayakovskî hez dikir jî, bi serhişkiya xwe û bi parastina azadiya xwe ya pîrekî, diket rewşa ku bêyî xwestina xwe tadahiyên mezin jî lê bike.

Lîlî di jiyana Mayakovskî ya şexsî û helbestvaniyê de rolek mezin lîstiye. Loma jî, bi baweriya min dema mirov bixwaze Mayakovskî bide nasîn, divê mirov wê jî bide nasîn. Ji ber ku Lîlî ne hew jina wî bû, hêleke jiyana wî bû. Piştî ku wê nas dike, evîna wê di dilê wî de dibe ew hêza ku xwestina jiyanê û xîreta nivîsandina helbestan dida wî. Û Lîlî bi xwe jî dibe kaniya bêdawî, sedema mezin û stûna bingehîn a serketina nivîskariya wî. Jiyan ji bo wî, hew bi Lîlî re xweş û bi mane bû. Xwestina jiyanê wê didayê û wê jê distend. Bêyî wê tu xweşî di jiyanê de tunebûn û ne gengaz bû. Loma jî bûye mijara helbestvaniya wî.

Mayakovskî ji bo Lîlî pirr helbest nivîsîne û piraniya helbestên xwe diyarî wê kirine. Dema cildê yekem ê nivîsên wî yên civandî 1928-an de



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

çap dibe, *Ji Bo Lîlî Juryevna Brîk* li ser nivîsiye û diyarî navê wê kiriye. Lîlî di nivîsên xwe de, Mayakovskî ji min re gotiye "tiştên min nivîsîn e, hemû ên te ne" dibêje. Mayakovskî nivîsên xwe yên nîvcî jî, ji bo ku eşkere bibe bê ka xwestiye çi bibêjê, diyarî Lîlî û Osîp kirine. Ji ber ku wan, ew ji hemû kesan baştir nas dikirin.

Lîlî û Mayakovskî evîndariya xwe sê salan hinekî vaşartî hiştine, lê ji 1918-an pê ve, eşkere wek jin û mêr jiyane. Ne evîna wan û ne jî ev bûyer bi xwe, nebûye sedema ku xwe ji Osîp bi dûr bixin, ya jî ew xwe ji wana bi dûr bixe. Piştî wê jî hersê, wek sê endamên malbateke bi rûmet bi hevdû re mane.

Zivistana 1919-1920 a sar, hersê di malekê de, bi hevdû re jiyane. Bi dû re di nav salên 1926-1930 de jî di maleke çar ode de bi hevdû re jiyane. Di malê de her yek xwediyê/a oda xwe ye, lê salona wana hevbeş e; ji bo rûniştina wana û mêvanên wan ên hevbeş e.

Li gora texmîna ku dikirin, wê jiyana pêşerojê wilo bûya. Jiyana mirovên îdeal ku Çernîşevskî di pirtûkên xwe de xeyal dikir, hêviya wan jî bû û ew jiyan dijiyan. Pirtûka Çernîşevskî a bi navê Wê Çawa Bê Kirin, pirtûka qanûna bingehîn a jiyana wan bû. Loma jî, ji dilxerabî û zikreşiyê dûr, wek mirovên hemdem, hersê dostên hevdû yên heta mirinê dimînin.

Hinek dibêjin ku Mayakovskî û Osîp herdu bi hevdû re û di wextekî de mêrên Lîlî bûn. Lê ev yek ne rast e. Rastiya tiştê ku bûye, ev e: evîndariya Lîlî û Mayakovskî, ne bûye sedema ku hevaltiya wan xerab bibe û nikaribin wek heval bi hevdû re bimînin. A rast, hîna beri ku ew û Lîlî hevdû binasin bi salekê, pêwendiyên wê û Osîp ên jin û mêrantiyê qediyabûn, hevaltiya wan platonîk bû. Hew du hevalên ku di malekê de dijiyan bûn.

Lîlî bi xwe, di vê derheqê de wilo nivîsiye: "dema min ji Osîp re got ku ez û Mayakovskî ji hevdû hez dikin, me her sêyan biryar da ku em tu caran ji hevdû veneqetin. Wê demê Mayakovskî û Osîp jî bûbûn du hevalên ku pirr ji hevdû hez dikirin. Êdî karê wan ê literaturî û ramanên hevbeş hebûn. Wilo bû ku me jiyana xwe bi hevdû re, bêyî ku em pêl normen ahlaqî bikin buhart; û em hersê jî xwediyên jiyana xwe ya şexsî bûn."



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Osîp, ronakbîrekî pêşverû bû. Di derheqa lîteratûrê de zaniyarî û enteresa wî pirr bû û mezinbûna Mayakovskî zû dîtibû. Piştî ku dibin heval, entresa wî ya di derheqa huner de pirtir dibe. Di demeke kurt a piştî hevaltiya pê re de, mala wî dibe navenda civînên her babet hunermend, helbestvan û nivîskaran û bi baldariyeke mezin xwe dide lêkolînên literaturî.

Piştî şoreşê, Osîp di çapemeniya rojane de, yek ji wan rexnegirên ku di derheqa edebiyatê de bi baldarî lê dihat guhdarkirin bû. Ên ku di derheqa zimên û lîteraturê de pê re diketin pêwendiyan, hemû di bin tesîra ramanên wî yên kûr de diman. Lê ji hemû kesan pirtir, alîkarî bi Mayakovskî dikir. Mayakovskî, ji bo wî ne mirov û helbestvan tenê bû, lê giranbuhayiyeke mirovatiyê tevî bû. "Mayakovskî ji bo min ne mirovek e, bûyerek e" digot.

Dema hevdû nasdikin, Mayakovskî hîna di serê rê de bû û pêwîstiya wî pirr bi piştgirî û alîkariyê hebû. Osîp wê pişgiriyê lê dike û wê alîkariyê dide wî. Osîp, ev yek ji xwe re wek watiniyeke bêşik dîtiye.

Osîp ji bo Mayakovskî şêwirdar û redaktorekî di dereca yekem de bû. Helbestên wî bi alîkariya fîlologan, ji hêla rezimani û dengan ve tekûz dikirin û dipîvan. Di derheqa rast organîzekirina mijarê de jî, ew şêwirdarê wî yê yekem bû. Berî helbestên xwe şanî hinekan din bike, ya jî çap bike, li bawerî û dîtinên wî yên di derheka helbestê de dipirsî. Pirê caran bêyî ku bifikire, helbesta xwe, wek ku Osîp pêşniyar dikir diguhert.

## Mirina Mayakovskî

1922 pêwendiyên Mayakovskî û Lîlî, wek jin û mêr sist dibin û hêdî hêdî digihije hevdûberdanê. Lê bi berdanê, hew pêwendiyên wan ên wek jin û mêr diqedin, lê hevaltiya wan dom kiriye. Mayakovskî bi dû Lîlî re hevaltî bi jinên din re jî kiriye, lê dostanî û hevaltiya wan her dom kiriye û di malekê de jiyane. Her çend salên dawî, Mayakovskî diçû ku, Lîlî jî ji bo piştgiriya hevaltî û parastina wî ya ji bêhêvîtiyê û bêhntengiyê, her pê re diçû. Lîlî pê zanîbû ku pêwîst e tenê nemîne. Pê zanîbû ku pişgiriya wê, hêza wî ya hunermendî qewîntir dike, xwestina wî ya jiyanê û hêviyên wî yên ji jiyanê bilintir dike û bilind radigire. Dema bi



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Veronîka Polonskaya re heval bû û dixwest pê re bizewice jî, Lîlî her pê re bû.

Lê mixabin ku ev babet hevaltî, hezkirin û piştgiriya Lîlî, ew ji xwestina mirinê azad nedikir. Rehên xwestina mirinê, xwe di dilê wî de kûr berdabûn, rewş lê giran ketibû. Êdî him Lîlî nema a wî bû û him jî hemû tiştên ku ji bo şoreşê kiribûn, hêdî hêdî dihatin ji bîrakirin û serketina şoreşê bi xwe hêdî hêdî têk diçû. Burokrasiyê rehên xwe di sîstemê de berdidan. Bi gotineke din, jiyan û dinya lê teng dibûn û hêviyên ku ji jiyanê dikirin hemû hildiweşiyan.

Sibeha roja 14-êNîsana 1930-î, hevala wî ya dawî Veronika Polonskaya, dike ku here karê xwe. Jê daxwaz dike ku li malê bimîne. Lê V. Polonskaya xwe ji nav destên wî dikişkişîne û derdikeve derve. Li gora agahdariyên ku mane, hîna nû digihe ber deriyê derve, dengê demançê ji hundur tê. Di dilê xwe de diteqîne.

Dîrok bûyerê wilo dizane. Lê polîsan, bi perestroyka re dest pê kirin û hinek tişt ji arşîvên wê demê eşkere kirin. 1993-an dor tê Mayakovskî û dosya wî tê eşkerekirin. Li gora encamên ku hinek lêkolîner ji dosya wî derdixin, tê gotin ku Mayakovskî xwe nekuştiye, lê hatiye kuştin. Ji ber du tiştan.

Di dosyayê de tê gotin: gullê ku Mayakovskî pê hatiye kuştin ji demançeke Browning e, lê demança ku xuyaye û ketiye dawa wî, yeke Mauser e. A duyemîn ku dema bûyer bûye, hestiyê bêvila wî li erdê ketiye û şkestiye. Ji vê yekê jî eşkere dibe ku bi ser devê xwe de ketiye. Lê li gora tecrubên tibbî hemû mirovên ku xwe dikujin, bi paş de dikevin. Ev jî tê maneya ku hatiye xistin û kuştin, dibêjin. Dibe ku hatibe kuştin, lê baweriya ku wî xwe kuştiye, bi van herdû tiştan tenê pûç nabe, sist in.

Mayakovskî hîna ji 23 saliya xwe pê ve çend caran dike ku xwe bikuje. Fîşekek dikir demançê, gindorê wê difitiland û pêwîst be ez bijîm, ji xwe nateqe digot; û dikir serê xwe û nigê wê dikişand. Li gora agahdariya ku Lîlî dide, cara yekem 1916-an wilo dike. Bi dû re ev kirina xwe çend carên din jî dubare dike, her carê xelas dibe. Lê cara dawîn wilo nake, xwe bi rastî dikuje.

Tiştê ku mirov ji helbestên wî yên evînderiyê fam dike, hîna salên



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

1915-an de xwekuştin dikeve bîra wî û êdî tu caran xwe ji wê ramanê azad nake. Di helbesta bi navê Lîlî can de, a ku heta sax bû çap nake de, xuyadibe ku dixwaze xwe bikuje. Ew xwestin, di helbesta bi navê "Mirov" de lê pîrtir dibe. Di sibata 1918 an de nivîsiye û çapkiriye. Li gora helbestê, diçe ser pireke bilind û dike ku xwe bavêje çemê Neva, lê nake. Wek Raskolnîkov dike, ji wir vedigere, lê wek wî tu kesan nakuje. Her çiqasî wê demê xwe nakuje û ji wir vedigere jî, "siya" wî li wir dimîne. Her demê çûye serdana siya xwe û wir ji bîra wî neçûye. Heta ku sax bû, di nabêra mirinê û jiyanê de çûye û hatiye. Her demê bi hisa ku hatiye mêvandariya jiyanê û wê rojekê here bû.

Kesên ku ew baş nasdikirin û di deheqa wî de nivîsîne, mirovekî zîrek bû dibêjin; erê jankêş bû, lê ji jiyanê hez dikir. Îcarê çima xwestina xwekuştinê hîna wilo zû dikeve bîra wî? Çima nikare xwe ji wê ramanê azad bike? Bi dû re pirseke din tê kirin: gelo çima xwe kuşt? Ev yek hîna jî tê munaqaşekirin.

## Rewşa dema ku xwe kuşt

Berî ku xwe bikujê, gellek faktorên ku xwestina xwekuştinê pê re xurtir bikin, peyde dibin. Piştî ku LEF (Eniya Hunermendiya Çep) dîsa dest bi weşanê dike, dijminan û rexneyên bêheq ku berê wan li wî bi xwe ne, lê pirtir dibin. 1928-an dev ji redaktoriya kovarê berdide û dibe endamê RAPP -yekîtiya nivîskarên proleter ên Rûsya. Endamtiya wî dibe sedema ku RAPP bibe du alî: li aliyekî ên din hemû ne û li aliyê din jî ew bi tenê ye. Ev kirina wî, dibe sedema ku nav wî û hevalên wî jî xerab bibe.

Ne bi gellekî piştî wê, diçe Parîsê. Li wir li Tatiana Yakovleva rast tê û dil dikeve wê. Dixwaze ku pê re bizewice, pê re vegere Moskovayê, lê nikare wê razî bike. Baş e, li vir bimîn, "lê ez ê rojekê bêm û te bibim" dibêje.

Tatîana bi eslê xwe Rûs bû û jiyaneke dewlemend dixwest. Lê xwestinên wî bi xwe ên ji jiyanê, bi peran çareser nedibûn û ne jiyaneke wilo bû.

Wextê vîza wî diçe û vedigere Moskovayê. Lê piştî ne bi gellekî ji bo ku biçe Parîsê, diçe daxwaza dirêjkirina pasaporta xwe û vîzê dike lê jê



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

re dirêj nakin. Demekê, kengî bixwesta, karîbû him ji xwe re û him jî ji xelkê re vîze û pasaport derxistana û direj bikirana. Lê êdî nema karîbû pasaporta xwe dirêj bikira. Bersiva "NA" bersiveke giran e. Li gora wî, helwesteke siyasî ye.

Piştî ne bi gellekî, dibihîze ku Tatiana yekî din kiriye. Lîlî, Elsa jê re name nivîsîbû. Ew name, wek gellek caran min bi xwe xwend. Min gellek caran namên wî jê re dixwendin. Dema bû qala Tatiana û zewaca wê, min dît ku Volodya reş û şîn bû. Ez poşman bûm ku min wir jî xwend, lê çûbû bûbû, dibêje.

Dema 1930-î, Mayakovskî 20 saliya karê xwe yê hunermendî bi jûbîla xwe eşkere kir, bi helbesta xwe ya Heta Deng Hebe Qîrîn, maça xwe ya dawîn bi berberên xwe û bi jiyanê re dikir. Lê tu tiştek bi destê xwe nexist.

Rexneyên ku ji çar aliyan lê dihatin girtin, ew pirr diêşandin. "Xelk te fam nakin" jê re dihat gotin. Lê ji pevçûnan westiyabû. Di civînan de, êdî dema êrîş dihatinê, "ez îşev nexweş im, ez nikarim pirr biaxivim" digot.

Rast bû, nexweş bû: evîndarî çûbû, hunermendî bûbû li gora xwestina polîs û leşkeran û miribû. Şoreş jî di kêşik de mabû û dernediket. Burokrat li ser karî bûn. Wî bi xwe şerekî hişk bi burokratan re dimeşand, lê tu kesan bi militanî tiştek di vî warî de nedikirin. Êdî hêviyên wî miribûn, dilê wî bûbû wek "qetek hesin", êdî nema tam ji jiyanê dikir û nexweş bû.

1-ê adara 1930-an, Meyerhold şanoya wî ya bi navê Şuştina li Himamê lîzand, lê şano him bala gellekan "nekişand" û him jî rexneyên bê pîvan lê hatin girtin. V. Yarmîlov, "tu çû, tu mir. Tu berê jî ew bû" gotibû.

Ev gotin pê giran bûn. Loma jî di nama xwe ya dawîn de, navê wî dide. "Yarmîlov, mixabin em negihan têr bihevdû bikevin" dibêje.

Heta dem tê nîsanê, êdî bi carekê re bê hêvî û pirr bêhnteng dibe. Bi ser de, nexweş bû, bi şewbê bû. Tik û tenê bû. Hêviya wî, ku wê qet nebe bikaribe Veronika li ba xwe bigire û bike ku pê re bizewice bû. Sibeha 14-ê nîsana 1930-î jê daxwaz dike ku li ba wî bimîne û neçe karê xwe, lê ew jî li ba wî ranaweste. Wê çaxê bû, ew dilê ku ew qase êş diki-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

şand, ji bo mirinê û peydekirina hesaniyê qul dike.

## Çima Mayakovskî xwe kuşt?

Osîp wilo dinivîse: "Me texmîna tiştekî wilo nedikir..." Lê rastî ev e ku, "xelk xwe ji bo du tiştan nakujin: ya ji ber ku ji wan astengên li pêşiya xwe, ji wan astengên ku dikin wana hilweşînin xurttir in, ya jî ji ber ku qet tu caran tu astengan li pêşiya xwe nabînin."

Astengên li pêşiya wî bi xwe, him pirr bûn û him jî dijwar bûn. Loma jî xwe kuşt.

Bê guman gellek sedem hebûn. Lê sê sedemên bingehîn ew hêdî hêdî gihandine biryara xwekuştinê.

– Mayakovskî him ji extiyariyê nefret dikir û him jî pirr jê ditirsiya. Li gora wî, ji 30 salî pê ve, extiyarî bû. Ji 30-î pê ve, mirov êdî diqermiçe, diranên mirov dikevin, mirov spî û kereh dibe. Li gora ku Lîlî dibêje, ahd dabû ku wê tu kes wî wilo diranketî û kereh nebîne. Hîna dema pirr xort bû, çend carekî gotibû ku wê xwe ji ber vê sedemê bikuje. Mayakovskî ji vê yekê ne xurtir bû.

– Ew û Lîlî ji hevdû veqetiyabûn, lê heta wê bîstika ku xwe kuşt jî, agirê evîna wê wek agirê hêtûnekê di dilê wî de rivîn dida. Piştî wê, ji dostên xwe û pîrekên xwe yên din re, bêtirs "ez hew ji Lîlî hez dikim. Ên din (pîrekên din S.D.), hew kêfa min dikare ji wan re bê ya jî kêfa min gellekî ji wan re bê..." Dema ev yek ji devê wî bi xwe dibihîstin, tê digihiştin ku nikarin pê re bijîn. Wek jin derketina Lîlî ji jiyana wî, ji bo wî bûyereke ku nedihat qebûlkirin bû.

Lîlî ji bo wî ne jin û heval tenê bû, sedema her babet xweşiya jiyana wî û kaniya nivîskariya wî bû. Lîlî, ew xweşiya bêhempa û hêviya di jiyanê de, hemû bi xwe re biribû, sebir û hedana wî qediyabû. Her ku diçû tunebûna wê bêtir pê xuya dikir, jiyan bêtir pê vala û bê armanc dihat. Mayakovskî ji vê yekê ne xurtir bû.

– Wek helbestvanekî şoreşker, ku bi hemû hêza xwe bîst salan ji bo civatê û sosyalîzmê, bi şev û rojê xebitîbû, xizmeteke mezin kiribû, lê dem hatibû ew ji "bin baskên partiyê û dewletê yên germ" hatibû avêtin û mahkûmkirin. Demekê dostaniya wî û Wezîrê perwerdekirinê Anatolî Lunaçarskî hebû, lê ew jî zû ji sahnê daketibû. Bi daketina wî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

re, him pêwendiyên Mayakovskî jî hatibûn birrîn û him jî tu kesên ku li wan joran wî biparêzin nemabûn. Salên dawî, dema li rewşê dinerî, didît ku tu giramî ji hukûmetê û partiyê negirtiye, didît ku karê wî û berhemên wî baş nehatine nirxandin. Ji xwe wan her çend salên dawî, ji bo ku berhemên wî negihin xwendevanên wî, rê li ber dihatin girtin. Nivîskarên din, ên ku navê proleter li xwe kiribûn, ji bedêla rexnan ve, êrîş dibirin ser, tiştên ku heq nekiribûn li ser wî dinivîsîn û ew biçûk dixistin. Mixabin ev yek bûbû wek helwesta resmî a li hemberî wî. Çi dikir ev helwest ne dihat guhertin. Vê helwestê dikir ku her rojê bimire. Her çend salên dawî, êşa ku vê yekê didayê, jiyan jê re zahmetir kiribû û pirr tenê hiştibû. Sala dawî bi xwe, bê kar û bê plan li kuçên Moskovayê li dost û hevalan digeriya. Mayakovskî ji vê yekê jî ne xurtir bû. Lê ne tu kesan ew fam dikirin û ne jî destekî alîkariyê dirêjî wî dibû. Ji xwekuştinê pê ve tu rê li ber wî "nemabûn".

Heger ku rewş wilo lê giran nebûba, dibe ku xwe ne kuştiba. Gava mirov li tevaya jiyana wî dinere, mirov digihije vê baweriyê. Li ber wî û hêviyên wî, vebûna deriyên nû her carê xwestina xwekuştinê ji ba wî qewirandine. Ji ber ku pirr dixwest bijî. Lîlî û Osîp ev yek zanîbûn û ew bi xeterê re tenê ne dihiştin. Lê dema xwe kuşt, herdu jî ne li Moskovayê bûn. Heger ku li wir bûna, dibe ku bikaribûna wî hinekî din jî rawestînin.

## Jiyana wî ya hunermendî

Mayakovskî jiyaneke kurt jiya, lê wek yekî ku pirr dirêj jiyabe kar û şer kiriye û berhemên giranbuha bi dû xwe de hiştine. 37 salan tenê jiya, lê berhemên ku giha di wan salan de binivîse, 13 cildan digirin. Berhemên wî yên bi nav û deng, *Ewrêkî Bi Şal, Li ser wilo, Heta Deng Hebe Qîrîn, Destanê V.I. Lenîn, Destana Oktoberê* ne. Gellek helbestên wî yên nîvcî ne, hene.

Mayakovskî, him helbestvan û him jî şoreşker bû. Bi hunermendiya xwe şoreşkerî kiriye û bi bedena xwe jî kar ji şoreşê re kirine.

Ew û wezîrê Perwerdekariyê A. Lûnaçarskî dost bûn û di nav babetekî hevkariyê de bûn. Li gora rewşê û hewcedariyên şoreşê, kurte helbest nivîsîne, derketiye li gund û bajaran geriyaye û xelk bi şoreşê ve girêda-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ne. Hewcedariya şoreşê bi çi heba, bi merdî ew kiriye û di wî warî de helbest nivîsîne. Dema şerê navxwe, di wê derheqê de, dema kampanya li hemberî birçîbûnê, di wê derheqê de, dema kampanya pakgirtina welêt ji gemarê, di wê derheqê de, dema kampanya kirîna malê welatê Sovyetan, di wê derheqê de kurte helbest nivîsîne û xelk teşvîk kirine. Ji bo ku xelk kurk û gorên hirî ji Leşkerê Sor re çêbikin û wek diyarî bidin wan jî kurte helbest nivîsîne. Loma jî di her babet mijarê û di her warê şer de, bê hejmar helbest û kurte helbest nivîsîne. Ji bo serketina Leşkerê Sor û Şoreşê, di nabêra 1919-22 de, hêla xwe ya wênevanî jî aktîv kiriye û wek berpirsyarê propaganda û ajîtasyonê yê daîra telgirafê, ROSTA, dor 6000-7000 afîş çêkirine û li ser wan afîşan kurte helbest nivîsîne.

Şano û senaryo, di nivîskariya wî de, ciyê duyemîn digirin. Di şanoyên xwe de rola serek, bi piranî wî bi xwe lîstiye. Fîlmek jî çêkiriye, wî û Lîlî rola serekî lîstine, lê bi dû re wenda bûye. Tê gotin ku kiriye romanekê binivîse, lê nebûye. Nivîsandina romanê her di programa wî de hebû.

Lê ev pêwendiyên di vê bilindiyê de, ji 1922-an pê ve hêdî hêdî sist dibin û heta sal tê 1924-an, baweriya wî ya li bolşevîkan diqede. Êdî ev yek ji hêlbestên wî jî tê famkirin. Êdî rêya wî û bolşevîkan ji hevdû vediqetin.

1923-25-an, wî û Osîp, Aseyev, Zoşçenko, Meyerhold, Pasternak, Babel, Şostakovîç û Ayzenştayn, kovara LEF û bi dû re jî LEF a Nû derxistine, redaktoriya serekî kiriye. Çûye li Fransa, Emerîka û Meksîkayê konferans li ser hunermendiya welatê xwe dane.

Bi kovara LEF û bi dû re jî LEF a Nû, dibe xwediyê mecala ku berhemên xwe bigihîne xwendevanên xwe û bersiva neheqiyên ku lê dibûn bide. Di derheqa helbest û hunermendiyê de şerekî hişk bi derdora kovara Oktober a RAPP re dikir. Li gora wî, piraniya kesên ku li dora RAPP bûn, durû û nezanê nivîskariyê û her babet hunermendiyê bûn, tirsonek û derewîn û şelaf bûn.

Ev şer dibe yek ji sedemên ku tadahiyên siyasî lê bibin, berhemên wî neyên xwendin û ew bi xwe jî tenê bimîne.

Dîroknas û hin ji şahidên wê demê, cesareta wî dipesinînin û dibêjin



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku bi berpirsyariya xwe ya rewşenbîrî rabûye. Ji ber tirsê, xwe sansur nekiriye. Li gora Vera, Nazim Hîkmet gotiye ku Mayakovskî mînaka cesareta mirovatiyê bû.

Wek mirov û wek helbestvan, wî û mirovên dema xwe li hevdû nedikirin. Her jê re "xelk te fam nakin" dihat gotin. Lê ew bi xwe di vê derheqê de bihêvî bû. Bawer bû ku wê mirovên pêşerojê, wî û helbestên wî fambikin. Lewra wê mirovên pêşerojê wek ên dema wî, ne bê adalet bûna, wê serfiraztir û çandeyartir bûna. Loma jî bawer bû ku wê helbestên wî, demên pirr dirêj tiştekî ji nûjentiya xwe wenda nekin, wê di pêşerojê de baştir bên nirxandin û hezkirin. Loma jî di helbestên xwe de, gazî mirovên pêşerojê dike.

Li gora ku pêwendiyên wî bi hukûmetê û partiyê re ne baş bûn jî, li dinyê tevî wek helbestvanê Şoreşa Oktoberê tê naskirin. Ji ber ku ji bo serketina Şoreşê pirr xebitiye. Li kuç û meydanên çar aliyên welatê Sovyetan, kurte helbestên wî li ser afîşan xuya dikirin. Afîş jî bi pirani wî bi xwe çêdikirin û di helbestên xwe de sosyalizm û komunizm di pesinand, gazî gelî dikir û dixwest ku alikariya şoreşê bikin.

## Mayakovskî û Şoreş

Sala şoreşê a pêşî, Mayakovskî li Petrogradê bû. Ew û hevalên xwe ji kirinên şoreşê yên salekê û bi piranî ji kirinên di derheqa çapemeniyê de ne razî bûn. Ji ber vê yekê hewcedariya ku bar bike Moskovayê dibîne û 1918 bar dike.

Bi Bûrlyûk û hevalên xwe yên din re manîfestoyekê derdixe. Eşkere dikin ku rewşenbîran ji bo bidestxistina azadiya çapemeniyê bi salan şer kirine, daxwaz dikin ku çapemenî ne ji navendekê bê idarekirin. Ronakbir jî di wê baweriyê de bûn. Lê wan bi xwe li hemberî siyaseta hukûmetê bi cesaret şer kirin.

Tirseke rewşenbîran ji bolşevîkan hebû. Ew bi xwe jî bi şik bû û xwediyê hinek baweriyên taybetî bû. Her çiqasî dûrbûna xwe ya ji baweriyên îlahî eşkere digot jî, Zerdeştiyê tesîreke kûr li naveroka baweriyên wî kiribû. Xuyaye ev tesîr bi xwendina wî ya Nietzsche lê bûbû. Ji ber ku di bin tesîra felsefa wî de bû û gellekan ew wilo dizanîn. Lê wî bi xwe, xwe bi wî awayî nedida nasîn. Nietzsche li welatê Sovyetan hatibû



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mahkûmkirin û paşverû dihat zanîn.

Ji hêla baweriyên di derheqa jiyanê de jî, di tesîra Dostoyevskî de bû. Wek lehengên wî, xwediyê jiyaneke bi jan û êş bû. Xwe dişiband wan. Wan baweriyan tesîr li pêwendiyên wî yên siyasî dikirin. Lê piştî ku şerê navxwe di nabêra hêzên hukûmetê û hêzên "dijî" şoreşê de firehtir bû û 1918-an di nabêra hukûmetê û sosyalîstan de şer dest pê kir, têgihişt ku êdî divê aktîvtir û eşkeretir li teniştа hukûmetê cî bigire. Ji ber ku êdî du helwest tenê hebûn: li gel û li dij. Heger mirov ne li gel ba, mirov li dij dihat hisab.

Madem em li gel in, divê em alîkariyê pê bikin û bikin ku a baştirîn jê derkeve. Bawerî û hêvî ev bû. Bawer dikir ku divê şoreş berdewem be. Lewra karên ku divabû bên kirin, hîna ne qediya bûn. Di manîfestoyê de diyar kiribûn ku pêwîst e şoreş, sê bingehan hilweşîne û sêyên nû li dewsa wan, ji nû ve avabike: şoreşa polîtîk, a ekonomîk û a exlaqî. Bawer dikir ku hîna a sêyem nebûye û heger ku nebûya, wê şoreşê nikarîba bi serbiketa. Heta ku mir xwediyê vê baweriyê û helwestê bû. Vê yekê jî ew û Partî ji hevdû bi dûr dixistin.

Li gora wî burokrasî di dewletê de xetereke mezin bû. Didît ku burokrasî di dewletê de bi cî dibe û rehan berdide. Siyasetvanan tiştek li hemberî vê yekê nedikirin. Lê wî bi xwe, li hemberî vê xeterê şerekî hişk dimeşand. Vî şerî kir ku di partiyê û dewletê de dostên wî hindik, lê dijminên wî pirtir bibin. Loma jî dema ku jûbîla 20 saliya nîvîskariya xwe amade kiriye, bi komên mezin xelk hatin û çûn, lê li ser navê hukûmetê û partiyê tu giregir nehatin jûbîla wî. Lê ji bo raporgirtinê, polîs şandin. Hatibû boykotkirin.

Bi vê yekê ne razî bû. Bi jûbîla 20 saliya nivîskariya xwe, dixwest resmî bê qabûlkirin ku ozanekî şoreşger e. Êdî ji şer û polemîkan betilî bû, hinek hesanî û aşîtî dixwest. Ji ber ku didît nivîskarên din hemû bûne xwediyên jiyaneke xweştir û ji wî bi xwe dewlemendtir in, li ba partiyê û hukûmetê xwediyên ciyekî baştir in û li wana bêtir tê guhdarkirin. Ne ku ji vê yekê çavnebar dibû, lê pê bawer bû ku wî jî bi xebata xwe hinek rihetiyên jiyanê, him ji piraniya wan bêtir û him jî berî wan heq kirine. Lê mixabin bi jûbîla xwe YÛVLAM, negiha armanca xwe. Hatibû boykotkirin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji nav siyasetvanên wê demê ên navdar, Troçkî hêza hunermendiya wî û ozanbûna wî dîtibû. Lê mixabin wî çaxî ew bi xwe reviyabû derve welêt û hewcedarî alikariyê bû.

Ew giramiya ku dema hîna sax bû heq kiribû, piştî mirina wî, ji ber ku Lîlî bi namakê, ji Stalîn bi xwe daxwaz kiribû, dane wî. Ya jî wek ku tê gotin, ji bo berjewendiyên siyasî ew bi kotekê kirin stûyê xelkê. Bi emrê Stalîn, wî wek serekhelbestvan eşkere dikin. Êdî hemû astengên fermî yên li ber wî û berhemên wî, piştî mirina wî hatin rakirin.

## Mayakovskî û tema wî û helbestvaniya nûjen

Di helbestên xwe de du temayên bingehîn bikar anîne: Evîn û pirsgirêkên civatî. Di helbestên xwe de di nabêra herdu teman de çûye û hatiye; pirrên caran herdu tema bi hevdû re bikar anîne. Ev hêla wî, wî ji helbestvanên din bi awayekî eşkere cuda dike û ciyekî taybetî dide wî. Di berhemên xwe de bi pûteyî ciyekî fireh daye evîndariyê û di ber vê yekê re, bi berpirsyariya şoreşkerî li çareserkirina pirsgirêkên civatî geriyaye.

Hêleke xurt a din di hunermendiya wî de heye. Berhemên wî ne soyut in, serpêhatî û bûyerên jiyana rastî ne. Tema berhemên wî, bi piranî ya pirr li nêzîkî wî bi xwe diqewimin û ew bi xwe ya di nav de ye, ya jî şahid e. Dema mirov berhemên wî dixwîne, tabloyên tema wî li ber çavên mirov xuya dikin û bi xwendina berhemê re diherikin. Tema wî jiyan bi xwe ye, bûyerên ku qewimî ne û serpêhatiyên wî bi xwe ne. Loma jî tiştên ku nivîsîne, (nav, dem, roj û cî) bê şik hemû rast in.

Di helbestên wî de, helwesta wî ya di derheqa hêla civatî de, serhildan û mîlîtanî ye, lê gava tê evîndariyê, serhildaneke wilo tune ye.

Di jiyana xwe ya şexsî, civatî û helbestvanî de, bi cesareta xwe û nûjentiya xwe bûye kesekî serek ê demê. Gava li hemberî şaşiyên ku di rêvebirina desthilata siyasî de dibûn şer kiriye, heta berî kuştina xwe bi çendakî jî, tu caran pêşeroja xwe nefikiriye û gav bi paş ve ne avêtine. Her bi cesareta şoreşkerî, bi berpirsyariya rewşenbîrî û bi nûnertiya mirovatiyê helwest girtiye. Hoy û mecalên ku bi navdariya xwe jî bidest xistibûn, ji bo serketina vê yekê xerc kirine. Xwestiye rûmeta mirovatiyê biparêze û hunermendiyê bike çekê ji bo jiyaneke xweştir û diyarî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mirovên dinyê hemûyan bike. Kul û êşên temamê mirovên dinyê di dilê xwe de civandibûn, bi her babet êşên mirovan diêşiya. Dixwest derdê hemûyan bibêje, binivîse û rabigihîne.

Mayakovskî helbest ji hêsîrtiya ahengê û xweşikirina kevnar xelaskiriye. Her wilo, helbestvan jî ji hêsîrtiya kevnar xelas kirine. Bi vê reformê mecala hemdemiyê da helbestvaniyê. Li gora wî, gava helbesvan bikeve dû ku helbestê xweşik bike, ahengê û pîvanan lê bike bar, misoger dibe ku mana helbestê qels bike, peyvên zêde bikar bîne û gellek caran jî peyva ku pêwîstî pê heye bavêje. Lê êdî demê helbesteke azad dixwest. Helbest bi metodên kevnar diqerime, ji hemdemiya xwe wenda dike, derd û mebesta bindestan ranagihîne. Divê helbestvan xwe bi xwe sansur neke, divê tevî binivîse. Loma jî li gora felsefa wî ya helbestvanî, divê helbest wek buharê azad be, wek çemekî bi xuşîn biherike, rast be û bi naveroka xwe wek risas be. Helbestvan jî divê di jiyanê de jî serek be, dive netirse, her demê rastiyê bibêje û biparêze. Zaniyariya helbestvanî li ser van bingehên asê ji nû ve avakir û diyarî mirovatiyê kir. Ev nûjentiya di helbestê de, bêguman ji bo Aragon, Nazim û Nerûda jî bû qonaxa destpêkirinê.

Karê Mayakovskî yê dawî, nama wî ya dawî bû. Dozdehê mehê nivîsîbû, lê kirina xwe nekiribû. Bi dû re, du caran li nama xwe zêde dike û çardehê mehê kirina xwe dike. Tê gotin ku di kirina xwe de bi şik bû. Name wilo ye:

Ji bo we hemûyan

Ji bo ku ez dimirim, tu kesan tawanbar nekin û paşgotiniyan nekin, tika dikim. Ez qet ji tişten wilo hez nakim, hûn dizanin.

Dayê, xuşkino û hevalno, bibihurin. Ev ne rêyeke xelasiyê ye, ez şîreteke wilo li tu kesan nakim, lê ji bo min bi xwe tu mecal û tu rêyeke din nemabû.

Lîlya, tu ji min hez bike!

Heval hukûmet, Lîlya Brîk, dêya min, xuşkên min û Veronîka Vitoldovna Polonskaya, endamên malbata min in.

Hêvîdar im tu dê jiyaneke mirovane bidî wana, spas.

Helbestên nîvcî bidin malbata Brîk, ew ê ji wana fam bikin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Wek ku tê gotin
"êdî lîstik qediya"
di nav ava jiyana nizm de
keştiya evîndariyê hilweşiya.
Êdî ez û jiyan ji hevdû xelas in
û sedema ku hûn rabin
li jankêşiya min
li kul û xemên min
û li pevçûnên min bikolin
tune ye.

Dilgeş bijîn.

Vladîmîr Mayakovskî

12- 4-1930

Gelî heval û hevrêyan, nekevin şika ku ez tirsonek im û bi xwe ne bawer im. Bawer bin, tiştekî din ê ku min bikira û bikarîba ez ji vê yekê vegerandima, nemabû.

Silavan li we dikim.

Bibêjin Yarmîlov, heyf e ku em negihan têr bi hevdû bikevin.

V. M.

Li ser masê 2000 ruble hene, di ber baca ku di stûyê min de mayê bidin. Perên min ên din li ba Çapxana Dewletê ne.

V. M.

*Süleyman Demir*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Qutikê Tewtewan

Ez ê ji qedîfê dengê xwe
şalekî reş ji xwe re bidirûm.
Qutikekî zer jî ji sê gaz avaçûna rojê.
Wek yekî tewtewe û Don Juanekî bêxem
hêdî hêdî di wê kuça bi wurşe û bi çûn û hatin,
Nevskî'ya dinyê re seranser ez ê bimeşim.

Bila dinya, ew jina zexel bi ser min hilbe:
"Tu destdirêjiya namûsa vê buhara şîn dikî!"
Ez ê bi qapanî bi rojê bikenim û lê vegerînim:
"Ez hez dikim ku li vir, li ser asfaltê bim û -r: yê biixînim."

Ezman şîn û sayî ye,
û delala min dinyê ji bo şaiyê cî raxistî ye.
Loma ez van helbestên wek bûkên kûkla dilgeş didim we,
wek darikên ber diranan tûj û pêwîst in.

Hûn pîrekên ku ji goştê min hez dikin, lê tu jî,
tu keçika ku bi çavên biratiyê li min dinere,
kenê xwe tevî bi ser min helbestvanî de bibarîn-
ez ê wek gulan bi qutikê xwe yê tewtewan ve bidrûm!

*1914*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Ewrekî bi şal

*Ji bo te, Lîlya*

**Destpêk**
Ramanên we
di zexeliya mejiyê we de xewnan dibînin
wek xulamên qelew li ser dîwanên narîn,
ez ê wan bi paçên xwîna dilê xwe,
û bi klamên qure hêrs bikim.

Êşa xurifandinê bi min re tune ye
û di canê min de tayên spî derneketine.
Ez dinyê bi qîrînên dengê xwe dihejînim
va ye ez hatim- xortekî spehî û bîstûdusalî.

Hûn ên dil tenik
evîndariyê di ber kemanan re dixwazin,
ên dilçort evînê di ber teplikan re dixwazin.
Lê tu kes ji we nikarin
derve û hundurê xwê li hev biqulpînin,
heta ku hûn bibin lêv tenê, wek min!

Werin, ez ê we fêr bikim-
jinên burokratan wek taximê melekan
bi kirasên spî di hêwanên narîn de
hûn lêvan ne ji dil lê digirin û vedikin
wek ku cêrî li rûpelên pirtûka xwarinê dike.

Heger hûn bixwazin-
ez ê tenê bedeneke har bim, biteqim
-lê ne wek gava li ba ewrên ezmên dibin-
Heger hûn bixwazin-
ez dikarim dilovan û çandiyar bim
-ne wek mêrekî, lê wek ewrekî bi şal bim.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ez ji xweşiya gulîstana Nîzza bawer nakim!
Ez li ser jinên wek îdiyoman kevnbûyî
û mêrên wek rêzên nexweşxanên hilweşiyayî
klama evîneke nû, rast û rê dibêjim.

I.
Ma di zikê we de ku ev taya malarîa ye?

Ev yek hatibû serê min.
Li Odesayê hatibû serê min.

Mariya gotibû-
"Ez ê saet çaran bêm".

Heşt.
Neh.
Deh.

Êvar ji ber pacan
çû bi nav şeveke tarî
a meha çileya pêşîn
a bi êş û bi eziyet
wek kabûsekê de.

Li pişt pişta min a bi êş hîrîna ken e
ji rivînên agirê çiran.

Ez bawer nakim ku hin bikaribin
min di vî halê wilo ketî de
pişt û mil qijilî
dêwekî lawaz binasin.
Ma îcarê yekî wilo ketî dikare çi bixwaze?
Yekî wilo ketî gellek tiştan dixwaze!



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Wê tu guhertin nebin
heger mirov ji maden be
û dilê mirov pariyek hesinê sar be.
Mirov dê şevên dirêj dîsa jî bixwaze
gazin û xwestinên zilamtiya xwe
daxe nav tiştekî nerm û pîrekî.

Û aniha
ez wilo girs û stûxwar
xwe dispêrim pacê û radiwestim,
camê bi eniya xwe dihelînim.

Ma gelo wê evîn bibe wek ku ez dixwazim?
Ma gelo wê bibe,yeke biçûk û xemgîn,
ya jî yeke rast û yekane?
Lê ez bi xwe wilo girs im,
bawer nakim ku ew bibe yeke mezin:
bêguman wê bibe yeke biçûçik û nazdar
hinek lew lew li ser evîneke şermok,
wê xwe ji ber tît-tîta tirimpêlan bide alî
lê bi zengilên tramwayan kêfxweş be.

Ez di pacê de
wilo bêhedan li bendî me,
li barana wek rûyê bi xwurî dinêrim.
Tavên baranê bajar li ber xwe bir
lê ez bi xwe hîna li bendî me.

Nîvşev zû bi kêrekê hat
da ser pişta rojê,
saet duwanzdehan girt,
û wek seriyekî ku bi giyotînê
ji bedenê bê birrîn da erdê.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Dilopên barana gewr
bi ser pacê de giriyan
kirin wek rebeneke xeyidî
wek rûyê cenawirên bi girî
li Notre-Dame li Parîsê bû.

Bi cehnema wê kiriye!
Ma ez têra wê li bendî nemam?
Devê min dike bi qîrînekê biçire.

Deng tê min:
wilo hêdîka ye,
wek gava nexweşek ji nav nivînan radibe
rehek ji canê min derdikeve.
Pêşî fitlek da xwe,
û bi dû re fitlan hêdî hêdî dan dû hev,
û bi dû re jî bi lezeke dîn dest pê kir,
xwe li yeke din gerand
û kişand dansa dînîtiyê, hûrraaa...
Suwaxa qata binî hilweşiya!

Ew rîş-
ên biçûk
ên mezin
bi lezeke ecêb
hemû dansê dikin
heta ku kabokên min
di bin wan de li hev ketin.

Û şevê dîsa ode şil kir bi giriyê min
çavên min wek kuçeke bi çirav in, êdî venabin.

Tavilê derî bi zîqînî vebû
wek ku otêlê tevî
diranên xwe qiriçandibûn.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Tu hatî hundur
wilo tije û bêhnteng
wek ku te dixwest bibêje "îcarê xelas"
te lepikên xwe lê qulpandin
û bi dû re dest pê kir:
"dengê min tê te-
ez ê yekî din bikim!"

Ê, ma çi ye,
ma wilo ecêb e?
Ez ê bi kêrî xwe bêm.
Qet ne xema min e, ez hedinî me
ez wek avêtina reheke
di yekî mirî de me.

Ma tê bîra te?
"evîn
pere
azwerî,
Jack London"-
te digot.
Û tiştê ku min dît:
tu La Gîoconda bû
divabû tu ji Louvrenê bihata dizîn!
Û bi rastî jî tu hat dizîn.

Ez ê dîsa bidim dû xweşiya bayê evînê
gava çirûskên êgir bidin birûyên min ên reş,
wê çavên min vebin û bibînin.
Ma wê çi bibe?
Di xaniyên şewitî de jî
bêmal û reben radizin!


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Tu qerfên xwe bi min dikî?
“cewherê evîna te ya helbestvanî
ji kopekên di mala xizanan de kêmtir e.”

Lê tu ji bîra nekî!
Gava qerf bi Vesuvîus hatibûn kirin
Pompey hatibû hilweşandin.

Guhdar bikin!
Efendîno!
mereqdarên dîtina gunehkariyan,
kuştinê
û bazarên bê rê.
Gelo we qet tu caran
tiştekî wek rûyê min,
wilo bi saw,
gava wilo sar û bêliv e,
dîtiye.

Û ez tê derdixim-
“ez”
ji bo xwe pirr biçûk im.
Yekî ku rê di min de lê teng e
û naxwaze raweste heye.

Elo!
Ew kî ye?
Dêya min?
Yadê!
Lawê te pir nexweşe.
Agir bi dilê wî ketiye, dişewite.
Silavan li xûşkên min Lyûda û Olga bik
nema dizane bê wê bi ku de here, bibêj.
Û bibêj ku peyv, henek û hemû gotinên vala



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku îşev di nav lêvên wî yên sotî re tên gotin
wek qahbikên kerxana agirpêketî
gava xwe ji pacan diavêjin, tazî ne.

Xelk hewê bêhn dikin-
Bêhna kizûrê tê!
Wa ne mîxferên biroqanî
ji nû ve bi lez tên!
Gelî agirkujan
solên xwe ji pê bikin
mirov bi dilê sotî ve hêdîka hildikişe!
Ez bîdon bi dû bîdonê de tije hêstir
pompe dikim
ji bo ku ez agirê dilê xwe vemirînim.
Ez dixwazim di mêrdewana parsûyan re dakevim.
Ez xwe diavêjim! Ez xwe diavêjim! Ez xwe diavêjim!
Lê mixabin di bin min de dişkin.
Mirov nikare ji dilekî agirpêketî bireve.

Ji nifşkê ve
ji lêvên peritî ên rûyê şewitî
ramûsaneke kizirî tê bîra min.

Dayê!
Êdî ez nikarim klaman bibêjim.
Dika koroya dêra dilê min şewitiye!

Peykerên peyv û hejmarên kizirî
ku vê êvarê ji kiloxê min derdikevin
wek zarokên ji malên şewitî direvin in.
Gava Lûsîtanîa şewitîbû
destên tirsê wilo ber bi ezmên ve bûn.
Agirê sor
li ezmên çavbeloq diçû mirovan



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

behitî di nav xweşiya malê de man.
Ez li vir im û qîrîn dikim pêşerojê:
agir bi min ketiye!

**II.**

Rûmetê bidin min!
Min tu tiştekî mezin nekiriye!
Lê hemû tiştên ku hatine kirin
ez gotina "nîhîl" li ser dixim.

Xwendin?
Min tiştek nexwendiye!
Pirtûk?
Ma kê xêr ji wan diye?

Min demekê bawer dikir ku
rêya afirandina pirtûkan ev e-
helbestvanek derdikeve
bi devê nîv vekirî bi zexelî radiweste
û wek bêaqilan dest bi lew lewê dike-
û tiştê ku bû jî, ev bû.
Lê aniha ez baştir dizanim-
berî ku klam bê gotin
ji bo hinek fêrbûn bi gera bê mane
di çar aliyên bedenê de birîn vedibin
û di kûraya çemê dil de bi dest û pêyan
li birahsemên îmbecîlla xeyalan dixin.
Gava ku kolan
ji ber êşa krampê, li hevdû diqulpin
û bi zimanê jêkirî nikarin qise bikin
bi piçikên kêş û allîterationan
li ser evîn û bilbilan tirşikê çêdikin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Em li bajaran
birca Babîlan ji nû ve radikin.
Lê xwedê
zimanê mirovan li hev digerîne
bajaran wêran dike
dike kêlangeh.

Kolan xwe li ber êşê digire, bêdeng e
lê qîrîneke çikandî di qirika wê de ye.
Hespên lawaz û taksiyên nepixî
li kinayî di qirika wê de mane.
Çûn û hatina li ser sênga wê
ji êşa zirav xirabtir anî serê wê.

Lê bi ketina reşê, bajêr rê ji ser girt.

Û gava kolanê-
piştî hemû tiştan!-
bi hêza pişkandinekê
komên xelkê avêtin meydanê,
derencên dêrê hilweşiyan;
ket dilê min:
wê bi klamên koroya serekmelekên xwe
xwedayê talanbûyî bê û ceze ji wan re bixwîne.

Bi dû re kolan rûnişt û gazî kir:
"Werin em herin xwarinê bixwin!"

Krupp û Kruppkên xwe bajar lewitandin
û xetên birûyên gefok jê re dan çêkirin.
Di nav laşên peyvên di devan de
êdî mirî û bêhn pêketî de
îro hew dudu pirr in û li pêyan in-
"Borşç" bi texmîna min,
û "beraz."



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Helbestvanan
bi îsk-îsk û girî
ser û çav werimî
xwe nehişî avêtin ser kolanê
û porê xwe kişandin:
"ma mirov dê çawa bikaribe
bi van herdû peyvan tenê
di derheqa evînê, gulên biçûk û buharê de
pêşdexistina helbestvanî bide bendan?"

Lê li pişt helbestvanan-
mîrên kolanan:
xwendekar
qahbik
û tacir...
Ka rawestin!
Gelî maqûlan!
Hûn ne xizanin
li vir parsa pariyan nayê kirin!

Em ên nûjen
em bi komên mezin bi pêş ve diçin
em qet guhdarî nakin
em ê ên ku wek bîlaga belaş
xwe bi nivînên cot ve asê kirine
hemûyan bi qulipînin.

Ma em ê rabin ji neyaran
parsa çend gotin qesîde
û çend şîretan bikin?
Me bi xwe çêkiriye
ew klama ku wek êgir bi gurînî
ji febrîqe û labûratûwaran bilind dibe.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Min çi ji Faust`e
heger ku bi derbikên şaiyan, di xeyalan de
sênga xwe li ezmên dide Mefîstofeles
û şerekî lidar dixe.
Ez dizanim-
bizmarek ji potîna min
pirtir tirsê dide ji xeyalên Goethe.

Ez
ê ku bi gotinekê tenê ji devê xwe yê zêrînî
ji nû ve can didim bedenê û azad dikim
ji we re dibêjim:
mitqaleke toza jiyanê
ji tiştên ku min çêkirine tevan giranbuhatir e.

Guhdar bikin!
Bibihîzin îcarê
bê Zerdeştê demê
çi dibêje bi hewar û nalîn.

Em
rûxavên bêxew
û xwediyên lêvên wek avîzan daliqandî
em
karkirên bende
di malên biqerêj de
ku jiyan hemû lê bi jahrî dibe
bi Lepra bacill tawanbar dibin,
em ji temamê ezmanê Venedîk`ê
ku bi deryayê û rojê hatiye çirisandin
paktir in.

Dev ji qesîdên Homeros û Ovîdîus berdin
ji bo me egîtên bi tenî û rû bixurî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

cî li ba wan tune ye!
Ez dizanim-
bi toza firra pêşî ya di dilê me de
wê ruhniya rojê bê girtin!

Zend û bend ji duan çêtir in.
Em nikarin parsa efûyê ji wextê bikin!
Em-
hemû bi carikê re-
qaîşên ragirtin û meşandina cîhanan
bi destan digirin.

Li Petrogradê, Odesayê, Kîevê û Moskovayê
ez derketim ser Golgatayên hêwanan
yek kes tenê tunebû li wir
ku qîrr nedan min:
"Li çarmixê xin
wî şeytanî li çarmixê xin!"
Lê hûn-
gelî mirovan-
dîsa jî hûn,
ji her tiştan pirtir
ez ji we hez dikim,
lê hûn in ên ku min fam jî nakin.

Bibêjin, ma we diye bê kûçik
destê ku lê dixe çawa dialêse!

Wek ku bi anekdoteke dirêj bikenin
hemû kesan ken û qeşmerî bi min kiribin.
Lê ez dibînim
di nav çiyayên wext re yek tê vir
tu kesên din wî nabînin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji ber ku li pêşiya hemû belengazên birçî
bêyî ku ên dûr nabînin hemû, bibînin
hezar û nehsed û şazdeh
bi taca gulên şoreşan xemilandî tê.

Ez pêximberê wê mizgîniyê me;
çi devera ku êş û kul lê hebin, ez li wir im,
çi liba hêstira ku dibare
min xwe pê ve çarmixê xistiye.
Êdî efûkirin li ba me nemaye.
Li wê devera ku demekê
dilovanî hatibû çandin
min hemû tişt ji bo îro birrîn.
Ev dijwartir e ji êrîşkirin û hilweşandina
nema zanim bê çend hezar La Bastîlle`an.

Û gava rêber bi anonsa serhildanê hat-
heger hûn bilivin,
ez ê ji bo we
canê xwe ji sênga xwe biqetînim
û pê lê bikim
heta ku pahn bibe!-
û ez ê wek aleke bi xwîn diyarî we bikim.

**III.**
Lê ma ji bo çi
û ma ji ku tên-
di nav çirûskên dilgeşiyê de
ev kulmên mezin û qerêjî radibin!

Rezîlê dîn
derket pêşiya min
û perda ku ez dixistim erê-na yê
rakir ji ser mejiyê min!



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Û wek gava mirov
xwe ji zikê keştiya şer
gava xewr dibe biavêje-
Burlyuk di çavên ji girî kul
wek xwîna meyayî bêmirês
û pelqijî re derket
rabû ser xwe,
hinekî meşiya
û bi dilovaniyeke ku ji yekî wek wî zikmezin
tu caran nayê hêvîkirin
got: "ev başin!"

Baş e gava îşlikekî zer
êş û kulên dil binixumîne!
Baş e
gava li ber mirinê
"Çokolata von Hauten vexwin!"
ji devê mahkûme idamê bi qîrîn tê gotin.

Û wê bîstikê
ez qîrîneke bengalî
bi tu tiştên li dinyê
naguherim...

Min wê bîstikê di nav dûmana pûro de
mirûsê Severyanîn ê wek qedeheke lîkorê dît,
kereh bû û vexwarin jê dibariya.

Tu çawa wêrî ji xwe re bibêjî helbestvan
û wek mirîşkeke spî bikî qid-qid û derkevî rastan?
Îro
divê em rabin
serê dinyê bi birrin
û kiloxê wê bikin aréna boksê!



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Hew tiştek tenê di bira te de ye-
"ma ez ne xweş dansê dikim?"-
Lê îcarê ez kêfa xwe
bi awayekî din dikim-
di nav qewadan de li kuçan
lîstikvanekî pokêr ê pevçûnker im.

Hûn
ên ku evîndarî tirş û tal kirin,
êdî tava wan hêstirên we yên bê dawî
kêr gihandin hestî,
ez ê îcarê rojê
wek monokelê di kortika çavê xwe xim,
we bihêlim û herim.

Ez ê bi kincên spehî
derkevim seyrana bin rojê,
bedena xwe bikizirînim, bêm hezkirin
û Napoleon di zincîrê de wek boncîkekî
wê hêdî hêdî bimeşe li pêşiya min.

Wê dinya
di nav lerza agirê di wî goştî de
mîna jinekê xwe li ber min raxe bi evîndarî .
Û wê tişt bi can bibin-
lêvên wan bilebitin,
wek zarokan bibêjin:
"şêlîno, şêlîno, şêlîno."

Ji nifşkê ve
berqê û ewran
çi biçûk û çi jî mezin,
ezman hemû hejandin.
Mina komên karkerên spî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

li hemberî aqida ezmên tevî
bi hêrs karberdanek eşkere kirin.

Ji nav ewran yekaneyeke bi saw hat
di firnikên fireh re bi carekê re fişand
û rûyê ezmên guhert çend saniyan
kir mirûsê zalimê Bîsmark`ê hesin.

Û yek jî
di nav dahfên ewran de mabû
destên xwe dirêj kiribûn hêla kaffé-
him dilovan bû wek dilê pîrekan
û him jî stemkar wek autodafé.

Di zikê we de
ku roj e vê êvarê
destê xwe dide kafé?
Na, general Gallîfet çû
asiyan gulebaran bike,
ne ew e!

Gelî betalan destên xwe ji bêrîkan derxin-
rahijin kevirên kuçan, kêran, demançan
û seqetên bê dest, hûn jî hemû
dikarin bi poşan bên wan
seriyên Danimarkî li wan xin!

Werin gelî birçiyan
û ên bixwêdan,
ên bêhêvî hemû
ku bi salan di nav xizaniyê
û devlêkirina sipiyande man!



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Werin!
Em ê duşem û sêşeman jî
wek rojên cejnan bi xwînê sor bikin.
Bila kêrên me bînin bîra dinyê
bê kê ew talan kiriye!
Dinya qelew,
wek jineke yar
ku Rothschild nema dixwaze bibîne!

Bila al di nav agirê fîşekan de li ba bibin
wek ku rojên şaiyan bi serbilindî li ba dibin-
û bi dîrekên elektrîkê ve bilind daliqînin
laşên taximê qesabên bi xwîn.

Min sond xwar
xwe berda ser çogan
min bi kêrakê birrî
bi dû hinan ketim
ji bo ku bikaribim bigirim.

Avaçûna rojê sor wek Marseillaise
di sikrata mirinê de li ezmên dihejiya.

Ji aniha ve kifş e,
dînîti ye.

Wê tu tiştek nebe!

Wê şeva birçî bê
di tarîbûna kor de bicû û daqurtîne.

Binere-
ezman dîsa Îskarîotiyê dike
bi çengeke stêrikên zîvînî ye ji destê xaîntiyê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Va ye hat!
Mamay her tiştan hildifirrîne xwe
li ser bajêr bi quna giran rûniştiye.
Çavên me nikarin vê şevê biqelêşin
ji Azef jî tarîtir e!

Min xwe di qorziyeke meyxanê de qijilandiye
ez canê xwe û perdê bi şarabê şil dikim
û ez dibînim,
çavên wê yên gurover li ser masê ne.
Awira Madonna ye di dilê min de dihele.

Ma tu çima ruhniyê
ji Gloria xwe ya ku bi şablonê hatiyê çêkirin
diyarî araqvexwuran dikî?
Ma ne tu dibînî
ku dîrok dubare dibe:
lawê te yê Golgatan diavêjin
û Barabas digirin.

Belkî ez bi qestî di şiklê mirovan de
rûyekî ji ên din ne nûtir hildigirim.
Belkî jî
ji nav lawên te
ez,
ê spehîtirîn im.

Gidî!
Ji bo ên ku di xweşiyê de
dest bi rizandinê kirine
wextê mirinê xurt bik,
ji bo ku zarok li vir
bi hev re mezin bibin,
da law bibin bav
û qîz avis bibin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Û ez hêvî dikim
ên ku li welatê me nû çêdibin,
bijîn heta ku bibin mirovên navser
û xebatkarên mereqdar.
Ew dê rojekê
navan ji helbestên min
li zarokên xwe bikin.

Belkî jî ez,
ê ku li ser axa împeriya Brîtanî
û mekînên ku zingarê nagirin nivîsiye,
ji bo mezhebê rasttirîn li dinyê
hawariyê sêzdemîn im.

Û dema ez dikim qîrîn
bi ceger û qeweta xwe tevî-
saet bi dû saetê de
ji sibehê heta êvarê-
dibe ku Îsa Mesîh bibine
bê çawa bêhna catira canê min difûre.

**IV.**
Mariya! Mariya! Mariya!
min berde hundur, Mariya!
Ez nikarim li kuçan bimînim!
Tu naxwazî?
Xuya ye tu dê bimînî
heta ku hinarkên min bibin kort
heta ku hemû kes jê tam bikin,
ez rûxav û reng spîçolkî bibim
û wek bêaqilekî diranketî
bibe lep-lepa min,
ji nû ve bêm bikim pin-pin
û bibêjim vaye êdî îro
"ez daxwazên bi rûmet" dikim.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mariya
tu dibînî-
ez ji aniha ve piştxûz û ketî me.

Li wê jêrê
li kuçê mirov dimeşin
çarqat e xebxeba wan
û di nav rûyê qelew de
çavên wan wenda dibin,
gelo ji çil salan karên giran
wilo hatiye serê wan-
û qeşmeriya kenê wan
ew xistine nav diranên min
-ku tu caran tobe jî nakin!-
ez di pirtikên kulîçên şaiya do derdixim.

Baranê tratuar bi girî vekirin,
di nav hewdikên avê de li wir
bê malekî rûvemirî raketiye
laşê kuça kevirî dialêse.
Li ser mijankên spî-
erê! - qeşa li ser mijankan
hêstir in-
erê!- hêstirên ji şirîneka çavên xilmaş in.

Peya hemû bi zimanê baranê alastîbûn
û di çi paytona ku hebû de
pêlewanekî qelew diçirisand:
ên xwedîkirî
bişkivîn
bez herrikî ji wan
û ji faytonê goşt û kulîçên cûtî
wek pelûla girik rijiyan.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Mariya!
Ma wê çawa gotinên nerm
bikaribin di wan guhên qelew kevin?
Heçê çûk in
bi xwendina xwe dijîn
dikarin ahengê bidin tika xwe,
lê ma ez Mariya
ez mirovekî ji xwînê û goşt im
ez di nav lepê kûça Presnya de
bi kuxika şeva êşa zirav ketim.

Tu min sax dixwazî Mariya?
Min berde hundur Mariya!
Tilîkên min ên ku mîna bi kirampê ne
bi stûyê çengelê derî girtine
û bernadin.

Mariya!

Mêrgên kuçan ji nifşkê ve tije har bûne.
Şerîta ku kirine stûyê min, asêtir dikin.

Veke!

Min diêşînin!

Binere-
li çavên min binere,
derziyên şewqan tê rakirine.

Ez berdam hundur.

Kurê min!
Ne tirse îcarê,


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hew ji bo ku ez di jiyanê de
çiyayekî ji newqkên pîrekên har
li ser stûyê xwe yê stûr hildigirim-
tiştê ku ez bi dû xwe de dikişkişînim
bi milyonan evînên pak in
û milyon milyon pîrekên xerab in.

Ne tirse
ji bo ku ez ê careke din
di roja tava zinêkariyê de
li ser hezar jinên xerab bidim-
"delalên Mayakovskî hemû!"-
li ser dilê vî dînî
qesreke tije Çarevna di çargavê de ye.

Were nêzîktir Mariya!

Tazî û bê şerm,
ya jî bi lerza tirsê
wan lêvên kulîlkînî bide min:
em negihane tu gulanan ez û dilê xwe,
di seranserê jiyana ku em jiyan de
hew bi sedan nîsan hebûn.

Mariya!
ê helbestvan
hezkirina xwe di sonnetan de ji Tîana re got
lê ez
ez mêrek im
ez ji xwînê û goşt im
û ez bedena te daxwazim
wek gava mesîhî
ji xwedê dikin:
"Risqê me



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

îro jî bide me".

Bide min Mariya!

Mariya!
Ez ditirsim ku ez navê te ji bîra bikim
wek helbestvanekî ez ditirsim
ku ez
gotineke ku êşa şevan dabû min ji bîra bikim
(gotineke di nirxê navê Xwedê de
û ewqasî jî mezin.)

Bedena te
ez ê jê hez bikim
û bifirkînim
wek hezkirina yekî leşker
ji bo çîma wî ya din
gava şer wî seqet dike
û tê hiştin.

Mariya-
tu naxwazî?
Xuya ye tu naxwazî!

Başe!

Careke din jî
ez ê bi xem û kul û ketî
rahijim dilê xwe
wî ciyê ku hêstirên xwînê jê dibarin
û hilgirim bibim
wek segê ku rahije nigê xwe
gava trên di ser re çûbe û birrîbe
dîsa bibe koxika xwe.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Wê rê dilşa be bi dilopên xwîna dilê min
wek gulan li ser toza qapûtê min bimînin.
Wê hezar caran dansê bike roj li dora dinyê
wek ku keça Herodesî dans kiribû
li dora serê Yahya.

Û gava dansa xwe kirin
piştî hemû salên ku jiyana min têrê kir-
wê bi mîlyonan dilopên xwînê
rêya mala bavê min
bê xemilandin.

Ez ê wî çaxî
şil û şerpeze û hetikî
bi şîna jiyana ku perpitî
bi herriya şarampola rê
xwe bikişkişînim pêşberî wî
ez ê bi çengê wî bigirim
û di guhê wî de hêdîka bibêjim:

-Guhdar bike xwedê efendî!
Ma tu bêzar nedibû
ku çi sibeh û êvara hebû
te çavên vî rebenê ji ewran, şil dikirin?
Tu çi dizanî-
baş e, ka were ez û tu
em ê fitlekê bidin sarsarokê
li dora vê dara ez mereq dikim
çi bibe, ya bi min dibe, ya jî bi te.

Tu, ê ku li her deran î,
di çi qula ku heye de divê hebî,
em ê şarabeke wilo deynin ser masa xwe ez û tu
da tu bêzarî di dilê hawarî Petrûs de nemîne.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Lê serê xwe bi kî-ka-poo dihejîne.
Û wê horî dîsa bihiştê dagirin:
Tu hew wilo ferman dikî-
û ez ê
bêyî ku di cezayê xwe bifikirim
li bûlvarê bi dû qîzên xweşiktirîn bikevim.

Tu vê dixwazî?

Na?

Tu serê gijikî dihejînî
û birûyên gewr diqurmiçînî?
Tu çi dibêjî,
gelo ew a li pişt te
ew henekvana bi bask
tiştekî ji evîndariyê dizane?

Ez jî berê melek bûm, ez berê wilo bûm-
Ên ku ez didîtim berxekî şekirî ye digotin
lê ez nema tu carên din ji porselenê Sevré
xweşiyan didim tu mehînên din.

Ya xwedayê mezin
te em kirin xwediyên dest û pêyan
te ji bo me
serekî ku em pê diaxivin û guhdar dikin li hevdû anî-
ma gelo te nikaribû tiştek bikira
ku bêyî em tu janê bikişînin
bikaribin hevdû maç bikin û maç bikin û maç bikin?!

Ez bawer bûm tu xwedakî bi birrîn, mezin û nemirî
lê tu hew qambostekî qerrîmî û rezîlekî nezanî.
Binere vaye min xwe tewand



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

û min ji stûyê gîzma xwe
kêreke solbendan kişand.

Henekvanê bi bask!
Tu her xwe di bihişta xwe de biqijilîn!
Here, bi bask û perîkên tirsiyayî li wir be!

Hilîn, rezîlê bêhnbuxur
ez ê te ji vir heta bi Alaskayê bireşînim!

Min berdin!

Hûn nikarin, min wilo hesan bigirin.
Ez dixwazim bi aramî çend tiştan bibêjim-
ez çi xelet, çi jî mafedar bim,
lê ez ê bibêjim.

Binerin-
serê stêrikan birrîne
tevkuştineke mezin li ezmên e
ji her tiştan xwîn diherike!

Lo!
ezmano!
şewqa xwe derxîn!
Va ye ez hatim!

Bêdeng e!

Gerdûn razaye
lepê xwe daye ber guhê mezin
stêrikên ku diçirisin,
lapûşk in.

*1915*

## Civîn

Nû şev dîsa bûbû roj,
ez her rojê dibînim ku kerem dikin:
Hinek diçin komîtê.
Hinek diçin komîsyonê.
Hinek diçin sendîqê.
Hinek diçin rêxistina partiyê.
Xelk wilo di nav maqaman de diçin ciyên xwe.
Kaxet wek tavên baranê bi ser wan de dibarin.
Û avanî, nû ji tazîkirinê bi ser xwe hatiye.
Û ji nav wan, dor nîv sed kesên
-ku girîng in ji artêşê,
îcarê ji hev vediqetin û diçin civînên xwe.

Ez dikim qîrîn:
-Ma tu kesê ku min qebûl bike tune?
Ez dixwazim rojekê ji vir xelas bibim.
-Heval Îvan Îvanovîç hîna li TEO û GUKON
di civînê de ye.

Ez xwe di sed derencan re berdidim.
Dinya tirsê dide min.
-Heger tu bixwazî, saeteke din were.
Aniha di civînê de ne
ji bo kirrîna şûşakî hibrê
ji hevkariya trösta herêmê re.

Û piştî saeteke din
îcarê li tu deverên xwedê
sekretera ku bersivê bide tune.
Ji ber ku hemû kesên di binya bîstan re
di civîna Komsomol de ne.

Ez bi şev dîsa diçim û dinerim.
Li jora avaniya heftqat, lempe pêketî ne.
-Ma gelo heval Îvan Îvanovîç hîna kerem nekiriye?
-Di komîsyonên A-B-C-D-E-F-G-H de ye.

Ez ji ber van civînan dîn dibim,
dikim wek lavînan biteqim.
Ez vedikişim û piştî çêran rehet dibim.
Li hundur, du nîv ji mirovan rûdinin.
Yek jê bavê xerabên reş e!
Lê ma îcarê ka nîvê din?
Gelo ma serê wî jê kirine?
Ya jî ma gelo ew kuştine?
Ez li vir û wir dikevim, dikim qîrîn, çêran dikim hîna.
Piştî tiştên bûyî ez dîn û har dibim.
Ji nû ve sekreter bi dengê aramtirîn ji dengên li dinyê
-Ew aniha di du civînan de ne.
Di rojekê tenê de bîst civîn kirine.
Divê em pê re bigihin. Civîn di dorê de ne.
Me xatirxwestin û oxirdan bê dilî xwe kir.
Ha ji vir, ji navikê berjêr ve
tiştê min ê ku ma li wir.

Ez ji ber xeman ranazim.
Sibê zû
sibeh wek kabûsekê dîsa tê ber çavên min.

Ax, heger civîneke ku bikarîba
ji bo rakirana hemû civînan çêbiba.

## Lîlî Can

### Ji bedêla namê ve

Dûmana tûtinê hewa xwar.
Oda min-
çû wenda bû
wek beşekî "doja" Krûçyonîş .
Ma tê bîra te?
Li vir, li pişt pacê bû
cara yekem min destê te
bi evîndarî firkandibûn.
Bi dilekî pola,
tu îro dîsa li wir î.
Sibe jî
tu dê min bi qewirînî-
û bi ser min hilbî.
Li wê hêwana erjeng
ji lerza destên min re
êdî tiştekî din dihat gotin-
nema rêya zendikan didîtin.
Ez dixwazim bazdim derve
xwe ji qamê de di kuçê werkim.
Wek heywanekî bêaqil
ji kamaxî
xwe bikim piç û parî.
Hêvî tê de nemaye delala min,
xweşika min,
ka em aniha xatir ji hevdû bixwazin.

Çawa be,
evîna min ji bo te
bargiraniyek e-
tu çawa jî bikî wilo ye.
Ka bihêl ez cara dawîn
ji ber xem û êş û şerpezetiyê
têra xwe bi ser te hilbim.

Dema ga ji karan bêhal dikeve
li quncikeke bêdeng,
di nav ava sar de radikeve.
Bêyî evîna te
tu derya tune ne ji bo min.
Di nav hêstiran de tika hinek dilovanî
li ba dilê te yê pola bê feyde ye.
Fîlê betilî, heger aramiyê bixwaze,
di nav qûma germ de, wek paşan kêfê dike.
Bêyî evîna te
tu ro û qûma germ
tune ne ji bo min,
û ez nema zanim
bê tu bi kê re yî û li ku derê ye jî.
Heger ev qase tadahî
li helbestvanekî din bûbûna
bi delala xwe re wê qumar bilîsta
ji bo ku serdest bûbûya
bi rûmetê û peran.
Lê tu xweşî û serketin
bihîstina tu dengên din
wek dema navê te tê gotin

xweşî û hedanê nade min.
Lê ez ê tu jehrê venexwum,
pacê venekim, xwe tê wernekim.
Devê tu demançên sar nedim cênîka xwe.

Tûjbûna tu xenceran
tirsê nade min-
hew awirên te-
Tu dê ji bîra bikî sibe
bê min çawa tac li te kir,
û canê min ê ku gul didan bi evîna te şewitî.
Wê bayê geşiya karnevala pozbilindiyê
rûpelên pirtûkên min hemûyan tev bidin.
Ma gelo wê ew pelên biçûk û bixîret
ku di peyvên min de zuwa vedibin
te hinekî rawestînin?

Bihêl qet nebe
bila ew gavên ku te ji min bi dûr dixin
xwe li ser dilovaniya min a ku ji evîna te
zuwa bûye raxin.

*Petrograd 1916*

## Li ser wilo

*Ji bo min û wê*

**Li ser çi-li ser wilo?**

Ev tema,
wilo bê kêr
û wilo şexsî,
di klamên min de
ne carekê tenê,
pênc caran hatibû gotin
ez wek siorekî helbestan lê fitilîbûm
û ez dixwazim careke din lê bifitilim.
Ev tema
aniha wek ku
di aşê duayên Bûdayan de tê hêran
û kêra ê reşik li efendiyê wî disû.
Û heger ku li Merîxê bi xwe jî
yekî bi dilê mirovan hebe
klama vê mijarê dibêje.
Ev tema tê,
jano didahfîne ser kursiyê
destên wî datîne ser kaxetan
û fermanê lê dike:
-Binivîs !-
Û gava ku wek bazekî
bi qîrîn ji ser kaxetan rabe
bi pêlên rêzên helbestan
wê ber bi rojê ve
klam bifûrin.
Ev tema tê,
wek sînyaleke telefonê

ji aşxana te tê,
û wê bi paş de vedigere
wek kumikeke qîvaran
di daristanê de wenda dibe,
û hefrîto radibe
li wir hinekî radiweste
bi dû re hildiweşe,
dibe lodek bi ser hev de,
di bin pêlên xuşîna loda kaxetan de.
Ev tema tê:
-Rastî !-
dike irrîn
Wê ev tema bê:
-Spehîbûn !-
fermanê dide.
Li gora ku
destên mirov mîxkirîne jî
ew valsa dawî bi xwe ye
klama ku mirov di çarmixêde
hêdîka dibêje.
Ev tema
elfaba te ya revoke bigir e-
mirov bi tiştên ku nivîsandî ne bawer e-
lê ji nifşkê ve
-A-
ji Kazbek jî dijwartire.
Mirov ji xwarinê dikeve
û xew bi jan e
û bi êş e.
Ev tema tê,
wê di tu rewşan de
ji xwe kêm nake
û hew wê bibêje:
-tu dê ji aniha û pê ve, hew li min binerî !-

Û mirov êdî hew wê tenê dibîne,
mirov dê wê wek alekê,
bi rivînên hevrêşimê sor
hilde ser dinyê û bihejîne.
Ev tema şût e!
Dadikeve bin hemû serpêhatiyan
û xwe bi lez çeng dike ciyekî kûr jêra hiş,
û bi hêrs
-ku mirov dikare vê yekê ji bîra bike!-
mirov di hejîne
heta ku canî ji bedenê diweşîne.
Ev tema
li hev herbilî derket pêşiya min,
ferman da:
-Ka
lixavên jiyana xwe bide min!-
bi mirûsekî tal çavên xwe berdan jiyana min
û mirov û tişt bi carekê re pijiqandin ji ba min.
Ev tema hat,
her tiştên din ji jiyana min avêtin
û ew tenê ma
bêyî ku bi tu kesan re bê par vekirin
ezîz li ba min.
Vê temayê kêr danî ser qirika min.
Bi çakûçekî hesinkeran hat min!
Dıl û cênîkên min dijenin.
Vê temayê rojên min kirin şevên tarî.
Ferman da- lêxîn, li gor ku ez ne ew im.
Navê
vê temayê:
......!

# Klama li ser zîndana Readîngê

Ez rawestiyabûm - tê bîra min.
Çi diçirisand.
Û ji vê re,
wê demê,
Neva dihat gotin.
(Mayakovskî - "Mirov")

**Li ser klamekê û klaman**
Hunermendiya klaman
hunermendiyeke kevnar e
lê heger ku peyv bişewitînin,
û heger ku peyv di derheqa tiştên ku dişewitin de bin,
ji nû ve dibin klameke li ser demên nûjen.
Pasaja Lûbîanka,
        dawiya kuça Vodopyanîj.
Virr ciyê şanoyê ye.
        Ha vaye
                hinek jê.
Ewa han
di nav nivînan de ye.
        Bi aramî raketî ye.
Ewê han, li ba wî,
        li ser masê
                telefonek heye.
Ev klameke li ser "wî" û "wê" ye.
Ne pirr ecêb nûjen e.
Lê a ecêb
        ku "ew"
                ez bi xwe me
û "ew" jî
        a ku ez evîndarê wê me.

Vir zindanek e.
Bêzariyeke kamax e.
Çima zîndaneke?
        Êvara Noelê ye,
roja çêbûna Mesîh e, şaî ye.
Baş e,
ma çima derabên pacan tune ne?
Wilqasî lê nepirsin.
        Zîndanek e ez ji we re dibêjim .
Maseyek heye.
        Û çara min a dawî li ser masê ye
                dê di têlê re biçe.

**Numrak di têlê re hat şandin**
Hima destê min giheyê-
û xwîn li min tewirî.
Telefon ji destê min ket.
Herdu tîrên ku diçirisin merqa febrîqê,
agir bi telefonê xistin.
Oda hirçê cîranê min...
        Cîranê min Balşîn
                dibawişke:
"Ma kengî wilo bû?
Tu çima wilo dikî hewar,
        ji êvara xwedê ve
                wek berazekî birîndar"?
Zengilê derî bi zûre zûr, birîneke din e.
Telefon bi xwe bizotekî spî ye, li wir e.
A te nexweşe!
        Raketî ye!
Bazde wir!
        Ecele here
                wir!
Dû ji goştê canê min diçû,

ji tirsan re xwîn ji min çû.
Pêleke çirûskan laşê min qelaştin.
Milyon voltan proppeke canê min hûr dikirin.
Lêvên min di doja telefonê de bûn qîr û kizûr.
Û numran,
bi leza şeytên
rê girtin û çûn,
rast di ser kuça Myasnîtskaya re
wek çirûskeke êgir pengizîn
û nobedara telefonê rakirin.
Çav beloq û behitî ye-
Noelê, ji bedêla du kesan ve kar dike.
Lempên sînyalan wek bizotên sor in.
Telefon lê dixe!
Û ruhnıya ku hebû
çilmisî!
Lempên sînyalan
bûn mirîşkên bi qid-qid
û têl jî gilokek rêsê li hev herbilî.
Ka 67-10!
Li pasajê yê!
Wir bide min!
Aramiya kuça Vodopyanîj!
Lê zû!
Bi hesanî dikare bibe teqin-
wê çaxê
tu
û
santrala xwe
difirrin ezmên.
Li kuça Myasnîtskaya pîre mêrek hebû.
Sed salan piştî vê bûyerê bi xwe bû-
ji vê hîkayetê pê ve qala tu tiştekî din nedikir-
Sed sal!

Ji zarokan hemûyan re digot.
Ez ji we re bibêjim, rojeke şemiyê bû...
Berî rojeke yekşemê bû...
Jamboneke Noelê jî hebû...
Bi texmîna min yeke erzan bû...
Wê çaxê ji nifşkê ve... teq!
Agir di bin nigên mirov de bû.
Dinya dihejiya!
Lê zarokan jê bawer nedikirin,
tu ji ba xwe dibêjî,
tu derewan dikî.
Zelzele? Li ba postê?
Zivistanê, digotin?
tu ne rast dibêjî.

**Telefon xwe diavêje ser hemûyan**
Tiştek di têlê re bi xurrîn çû,
kovika deng wek volkanekê dikele,
hengama sînyalan bêdengî hilweşandine,
telefonê bagera xurrîna hilweşînê li darxistiye.
Bi zûrîn
û tep-rep,
qîrînek çû û hat û fitilî
û bi şelpînekê li dîwêr ket.
Êdî bi hezaran sînyal
wek birqê diketin
li dîwêr diketin, dipengizîn,
diketin bin kursiyan
diketin bin nivînan.
Sînyalekê ji jor rê girt erdê.
Wek şepiyekê pengizî dîsa,
wegeriya erdê û hilweşiya.
Pacên malê
û derîkê firnê

hîna li wir dilerizîn
hemû tiştên malê
bi tonekê dilerizîn.
Êdî wek ku hilweşîneke
li çar aliyan xurrîneke
gırtiye ser malê.
Telefon di nav pêlên bahoza
zengilan de mabû.

**Şahida duelloyê**
Ji xewa giran,
reşkên çavan
hima dibînin-
di nav hinarkên sincirî de
wek serê derziyan in.
Cêrî bi zexelî
bi axîn û oxin
rabû hat ser telefonê.
Rûyê wê wek sêveke kelandî
eniya wê bi ramanan qijilî ye.
-Ma ew kî ye?
Vladîm Vladîmîç?!
Ax!
Bi şelp şelpa şimikên xwe
vegeriya ba xatûna xwe.
Wek dema şahidê duelloyê
hêdî hêdî navê vedike,
hêdî hêdî gav dimirin...
hima yanî deng tê bihîstin...
Wenda dibe wekî din dinya
hemû ji ber çavan.
Û tiştekî biyan lûlê li min rast dike.

**Agahdarî ji dinyê**
Di hemû civînan de gotarvan
destên wan wilo bilind
bêdeng û bêliv man.
Hew wilo mane,
devên wan ji hev e
û guhdar dikin,
û li vî alî,
ji şaiya rojbûyinan
li şaiyeke ji dayikbûnê dinerin.
Ji xwe hew qir-qir
û lew-lew e
jiyana wan.
Û malên wan jî
dergeha gemarê.
Dema li min dinerîn,
wek ku bi esehî bizanibin
wê ev duello
evîna min bi xwînê biqedîne.
Şîqînên sîrenan li ber bê hişk mane.
Çerxa sewsîbûnê rawestiyaye.
Tiştê ku heye,
tenê ciyê duelloyê
û Doktor Zeman e
bi bandaja bê dawî ya mirina derman e.
Moskova-
meydana ker ji Moskovayê dûr e.
Oqyanûs-
oqyanûsa bêliv li pişt çiyayên dûr e.
Gerdûn
hemû
bi dûrbînekê xuya ye,
dûrbîneke mezin (bi paş û pêş ve).
Aso pan bûye

        rast bûye.
Şerîtek e.
        Şerîteke kişandî ye.
Li seriyekî wê
        ez im di oda xwe de,
li seriyê din jî
        tu yî di oda xwe de.
Û di nav me de
        mirov dibîne,
        spehîtir e ji gava di xewnan de,
kuça Myasnîtskaya bi kirasê ji berfa spî
wilo bi serbilindî
        wek mînyatureke diranên fîlan
                xwe dirêj kiriye nav gerdûnê.
Sayî ye û ruhnî ye.
        Her tişt xuya ne.
                Îşkenca sayîtiya zelal.
Bi hunermendî hatine hûnandin
        gulîkên ji porê wek berfê spî ne
ew têlên kablo yên zirav
        ku di kuça Myasnîtskaya re diçin!
Û êdî her tişt
        ketiye destê wan.

**Duello**

Yek!
        Mirov lûlê li hev rast dike.
Hêvî
        pêjin
                xeter xuya dike.
        Dudu!
                Îcarê
hew rawestiya ye
        bê lerz û bê liv e

di nava çavên min de ye,
duedar in,
her bi girî
û bi hêstir in,
û ez dixwazim bikim qîrîn
êdî li xatûna destgiran:
-Ma tu li bendî çi ye?
Tu wilo rawestiya ye
de wek d`Anthés bike.
De zû!
Fîşekeke bi jehr
û ji çapa mezin
di têlê re
expres bişîn-
lê gotin,
di têlê re ji wî seriyê din
gava di nav du pişkînan de
ji nav memikên cêriyê dikevin
ji fîşekan xerabtir in,
wek kîroşkeke dabeliandî di zikê marekî boa de
ez dibînim ku peyvekê
bi lez di têlê re
rê girtiye vir .
Ji peyvekê xerabtir e-
ji dema pevçûnên kevnar
gava ku mirov bi diranan yeke mê zeft dikir e-
ji wê dema mirovên şikeftan
bi lerza û hêrsa çavnebariyê
hûtek di têlê re
xwe dikişkişîne vir.
Ma ev dikare...
Erê çawa, dikare!
Lê na, tu kes ji mîkrofonê nayê der,
û rûyê xelkê şikeftan nema xuya ye.

Hew sûretê min bû wilo xuya dikir.
Namedorekê rêbikin komîta rêvebir!
Gelo ev rast e, li gora programa Erfurt e?
Di nav şînê re,
        dîn û bêhnteng,
di nav mejî de xwe veşart wî hûtê gir.

**Çi nikare bê serê mirovekî!**
Şiklekî spehî ye.
        Hûn bi xwe bibêjin!
                Gelî hevrêyan!
Wê helbestvanek,
        hevkarekî Îzvestiyayê
                ê bisaw û xatir,
wek şexsiyeteke çandê biçe Parîsê,
bi lapûşkên di solê de kursiyê dikole
        bê sebir û bê hedan e.
Do mirov bûm-
        lê bi nifireke bi lez
bûm hûtekî bi pirç ez!
Bûm zir hirçekî
        bi qutikekî pirçdirêj.
-Ma tu jî dê biçî wir? dibêje,
        di telefonê de bi nal nal!
Here warê xwe, ba hevalan!
        Ba ewên derya qeşê tu ji wan!

**Hirçbûn**
Wek hirçekî
        wek gava pirr hêrs dibe
di navgînêde li hemberî dijmin,
        ez li hemberî telefonê û têlan
                sênga xwe dizewirînim.
Lê li hemberî rimê

bêhal diçilmise dil!
Xwîn jê diherike.
Rengê sor dide der
li ser sênga min!
Hewarê şevê,
vê xwînê û nalînê
tu bialês xwe!
Ez nizanim
bê ma hirç
digirîn,
lê heger digirîn
wê wilo bigirîn.
Ha wilo:
bê weynekî,
ji nava xwe dinalin,
heta ku dibe reniyeke nalîn
da hirçê cîranê wan Balşîn
li pişt dîwêr li oda din
şiyar bibe gava dikin irrîn û dinalin.
Gava hirç digirîn wilo dikin:
bêliv radiwestin
bêvila xwe didin ber sermê,
digirîn û dinalin,
heta ku dibetilin
digirîn û dinalin,
û bi dû re dadikevin kuna xwe,
bi bîst nenûkan bi kuna xwe dikevin.
Pelekî daran biçirre
îcarê hilweşîneke mezin.
û xemgînî dest pê dike.
Heger ji nifşkê ve tiving wek çaman
gwîzikên xwe ne reşînin, xem nake.
Tiştên wilo bi serê hirçan de dikevin.
Ez wek hirçeke bi pirç xuya dikim,

lê ji çavên ku pirç jê re mijankin
                                        hêstir dibarin.

**Oda ku dilopan dike**
Nivînek...
        perrî ji hesin,
                  lihêf ji rîtolan.
Ewê han li ser nivîna hesinî raketiye,
        bê hal e
                  û lal e.
Ricfekê dest pê kir.
        Di nivînan re derbas bû.
Nivînên rû qermiçî, şil û pilî bûn.
Sar wek qeşê, av çîmên wî dialêse.
Ma ji ku tê evqase av hemû?
        Barana buhara çile?
Na!
Ez giriya me.
        Ez girîko me.
                  Şelp, şelp.
Evqas hêstirên yekî tune ne-
        Ev nikare rast be.
Belkî ji serşokê tê!
        Av li ser lihêfê.
Di bin masê de av
        û li pişt dolavê av!
Ji ser dîwanê dera han
        xuşîna avê ye,
sindoqek di pacê re li ber çû.
Pixêrî...
        Qûnikek çixarê...
                  min avêtibû
                                    dan dû.
Ez nav di xwe didim.

Ez ê wan bizotên bi qapan
wilo vemirînim.
Lê ma tirs!
ma ew bi ku de çû?
Tifik bi ku de çû?
Verşteke ji vir dûr çûn.
Verşteke ji vir dûr,
qeraxeke avê dişewitînin.
Her tişt li vir hatine şuştin,
heta bi wê bêhna pîs
a wê komira qelp
ku daîm wext
ji aşxanê dihat.
Çemekî mezin e.
Qerax pirr dûr in.
Xamoş e!
Ba ji Ladogayê dike fîzîn û tê!
Çemek e-
Çemekî pirr mezin e.
Ev çi eziyet e!
Çem ji ber sermê diricife.
Lê ez di nav de xuya me.
Ez wek hirçekî cemser
qeşa spî hişk zeft dikim,
û di qulekê re derdikevim.
Qerax di ber min re diherikin
dîmen bi dû a din de derbas dibin.
Di bin min de balîfeke ji qeşayê heye.
Ba ji Ladogayê tê.
Guhikên balîfa min binav dibin.
Keriyê balîfan
wek hêzên keştiyên şer
di ber min re derbas dibin.
Ez diherikim.

Ez li ser balîfekê diricifim.
Lê mixabin vê avê, sehek pak nekir:
ez ê ji aniha û ne dereng
di bin nivîneke kevirî
ya jî
pirekê kevim.
Ha wilo bû ev:
ez û ba.
Ev çem!..
Na, ne ev çem,
yekî din bû.
Na, ne yekî din bû!
Ha li vir bû
ez rawestiya bûm.
Ha li vir bû - diçirisand.
Îcarê tê bîra min.
Hişê min tê serê min.
Lê ez nikarim bibêjim:
de bi paş ve vegerin!
Hêzên keştiyan wilo nakin
bi paş ve venagerin.
Eşkeretir û eşkeretir e...
Zelaltir û zelaltir e...
Aniha îcarê misoger e!..
Wê ewê han bê!
Ew!!!

**Mirovekî ji berî 7 salan**
Pêl nigên pirê dialêsin.
Ew bêliv,
erjeng û hejar,
li tenişta bajarê mezin
li ser caxa pira bilind
ku ji bêgaviya min

hatiye çêkirin,
noqî ava jêr rawestiya ye.
Pira bilind
wek ku tevnek ji textên mezin
bi ezmên ve hatibe çêkirin.
Nigên wê yên pola
ji nav avê nuwaze bilind dibin.
Ez awira xwe bilindtir,
û bilindtir dikim...
Wa ye li wir e!
Li wir e-
xwe daye ser caxê
û lavan dike...
Neva, mın bibexşîne!
Lê na bexşîne...
Ranaweste.
Neva dilovaniyê bike!
Leza wê ya dîn
efû nake.
Ew!
Ew-
li ba rivînên ezmanê sor e,
min ew çikandiye
mirovek e.
Ew li wir e
porê xwe yê dirêj diavêje paş xwe.
Ez leppên xwe didim ber guhên xwe.
Dikim qîrîn, lê bêfeyde ye!
Deng tê min,
deng tê min
dengê min bi xwe ye.
Mîna kêrekê sênga min diqelêşe.
Dengê min bi xwe ye-
li ber digerre

tika dike:
Vladimir!
Raweste!
Dev ji min bernede!
Baş e, ma te çima nehişt
ku ez xwe bavêjim?
Bihêle bila dilê min
bi nigên pirê ve
bibe piç û parî.
Ev heft sal in ku ez li vir im.
Ez li jêr di nav avê de dibînim,
ku ez bi zincîrên malikên helbestan
bi caxê ve hatıme girêdan.
Heft salan bêyî ku av
awira xwe ji min qut bıke.
Ma kengî ez ê azad bibim,
kengî wê zincîr bên qetandin?
Belkî tu jî qullizî be nav wan
nav ên ku dixwin û vedixwin
hev maç dikin
û di xenêbûnê de
qelew dibin?
Te kiriye serê xwe
ku wek dizekî ne ayan
têkevî nav jiyana wan,
dilgeşiya wan!
Lê tu vê kirinê ceger nekî!
Destên wî sist bûn.
Cax berdan
ji bo ketina nav qelşa devê avê
di bin pirê de
bihêrs e
tî ye û bêhis e.
-Tu nikarî wilo hesan xwe xelas bikî!

Ez bûm,
ê ku gazî te kiribû.
Ez ê te dîsa peyde bikim.
Tadahiyan li te bikim.
Dev ji te bernadim.
Ruhê te bistînim!
Li wê derê,
dûrî bajêr,
dîsa deng tê min.
Noelê pîroz dikin.
Ê, ma wê çi bibe, heger pîroz dikin?
Bibêjin, bila derkevin!
Bila biryareke komîta birêvebir tedbîq bikin.
Da tadahiyên ku li min dibin betal bikin,
dest deynin ser êş û kulên min!
Heta wê dema ku ji evînê
azadbûna min
di ser wan pêlan re
ku jê re Neva tê gotin,
bê hewara min,
tu jî dê bê evîn
bimînî li rastan
wek min.
Di wê xweşiyê de bimîn!
Di nav kevirên dîwarê malê de
bifetis!

**Min xelas bike!**
Raweste balîfê!
Lê bê feyde ye!
Ez bi leppan dibim alîkar-
bêrikên bê xêrin.
Pir biçûktir û biçûktir dibe,
ava Neva

ez gellekî dûr birim.
Ji aniha ve ez pirr dûr im.
        Belkî konaxa rojekê dûr im.
Rojeke sax ez ji pirê
        ji siya xwe ya li wir dûr im.
Lê birrîna dengê wî ye, li dû min.
Bi şirqîn û şelpîna babirêkên xeter
                bi lezekê dîn giha min.
-Ma tu bawerî ku tu dê bikaribî
        çirisandina pêlên Neva ji bîra bikî
Tu tiştek nakeve bedêla wan!
Piştî mirinê jî wê bên bîra te
bê di helbesta "Mirov" de
        çawa radibûn ser xwe.
Min kir qîrîn.
        -Ma ev misoger e?
Bahozê ji dinyê re eşkere kir-
        na, ev tu caran ne misoger e.
Min xelas bike! Min xelas bike!
        Min xelas bike! Min xelas bike!
Ha waye
        mirovek li wir e
                li ser pirê ye
                        di ser Neva re ye!

## II.
## Êvara Noelê

**Rastiyeke xewnane**
Qerax di ber min re diherikin-
        dîmen bi dû dîmenan de diherikin.
Di bin min de-
        balîfeke ji qeşayê.
Ba ji Ladugayê

guhkên balîfa min binav dibin.
Keriyê balîfan
hêzên keştiyên şer
di ber min re derbas dibin.
Ez di balîfa xwe werdibim
ez xwe li ber pêlan nagirim.
Min xelas bikin! hewara min e.
Tavilê çem rawestiya-
deryake mezin derket ber min.
Mezin û bi saw-
oqyanûsek e.
Min xelas bikin!
Min xelas bikin!
Sed caran sed ez gazî dikim
pîlên topa hewara min
dîsa deng didin.
Li ber nigên min
felqekî spî wek hîzêr
serê xwe hilda
mezin bû, giravekê bejin da.
Dûrtir û gellekî dûrtir çû,
û birrîna bahozê miribû.
Dora min kertir û kertir bû û çû...
Tu derya nînin aniha
ez
li ser berfê me.
Li dora min-
axa zuwa heye
heta çav dibînin.
(Ji berfê hinekî şil e ev war)
Warê zuwa- ev çi peyv in!
Ez girtiyê berfê û bahozê me.
Gelo ev çi welat e?
Ev çi war e?

Grön-
        Lapp-
                land e,
ya jî welatê evînê ye?

**Êşa ji rastiyê**
Siyê girtiye ser dîwaran û serbanan
        petêxa hîvê di nav ewran re
geh xuyaye geh jî wendaye.
Parka Peter-
        Ez bazdidim-
                li pişt Şodînkayê,
Tverskaya bi kirasekî spî tê pêşiya min.
A-u-u-u!
        "u" ya dawî çû heta kuça Bexçan.
Automobîlek bû
        belkî jî paytonek bû
bêvila min
        gazekê bû
                bi nav berfê de çû.
Wek gullên demançan li ser hevdû
        gal-gal bi min re bûn!
"Ma çavên te dîsa NEP kirî ne!
Tu çi heywanê çavgirtî ye?
Bi NEP'ê nemeşe!
        Nepekê ji dêya xwe bistîn
qirdikê karnevalan!"
Wîîî!
        Erê tewera,
ma ne ez hirçek im.
Na, ez ne hirç im.
        Hûn, ên ku diçin û tên
                min fam bikin!
Ez ne hirç im,
        hew ez wilo xuya dikim.

**Mesîh**

Ji wê dûrê
        ji ser tixûban
                yekî hûr tê vir.
Her ku tê, gavên wî xurtir dibin.
Wek taceke gulan diçirise
        hiva geş li pişt wî .
Ez ê tika bikim
        bila bê ser keştiya min,
                bê alîkariya min.
Ew Îsa ye!
        Dişibe Mesîhê me!
Cirxweş û dilovan e
        hîv taca serê wî ye.
Hat nêzîktirê min,
        rûyê wî ciwan û bê rî ye.
Lê ne rûyê Îsa ye.
        Pirr ciwantir e.
                Dilovantir e!
Hat nêzîktir aniha, na...
        xortekî komsomol e.
Bê kurk û şewqe ye.
        Bi trenchoat e û nû hatî ye.
Wek şagirtekî dîndar
        destên xwe didan ser hev.
Wek ku di derheqa tiştekî de diaxivî
        lebt û şikil dida xwe.
Berf wek pembo ye.
        Li ser pembo dimeşe.
Pemboyê wek zêrê zer-
        Ma gelo we peyveke wilo
                bê mane bihîstiye?
Lê şîndarî wilo ye,
        dilgeşî hemû

dibe bêzarî.
Tavilê bi klameke qereçîtî bi dûr ket.

**Romans**
Xort çû hêla rojava
çû wê dera ku ruhnî ye.
Tîrêjên roja êvarê diçirisandin.
Berf li dora malên Tverskaya wek zêrr bû.
Xort bi rêya xwe de diçû
çavên wî di ruhniyê de venedibûn.
Bê xem dimeşiya,
lê ji nifşkê ve-
rawestiya.
Destên wek hevrêşim-
pola ne aniha.
Tîrêjên rojê şop dihelandin.
Êvar bû, dereng bû.
Li xeta asoyê nerî,
hîna dûr bû.
Gava berfê çîma wî şikand
qirçîn jê hatibû-
Lê ji bo kê?
û ji bo çi?
Û kî fam dike?
bayê diz paşil û bêrîkên wî saxtî kir.
Nama wî ya dawî bi xwe re bir.
Û ji Parka Peter re eşkere kir:
-Bi xatirê te...
Êdî bes e...
Tika dikim,
nexin stûyê tu kesên din.

**Tiştekî ku bê kirin tune ye**
Bikêmasî ew reben

pirr dişibiya min!
Guneh bû!
        Ne karê aqilan bû!
                Ez bi lez çûm ba wî.
Min kurkê bi xwîn,
        ê şil û şerpeze jê kir.
Ez ji te re bibêjim, heval!
        Ez yekî din dinasim
                ji wilo xerabtir hatiye serê wî-
ev heft salin ku li ser pirê rawestiya ye
        û li avê dinere.
Min xwe di kurk rakir-
        lê çapa xelet bû.
Min diran qiriçandin-
        min bi zore li xwe kir.
Ji bêvilê heta lapûşkan
        min pirça xwe ya hirçan hilkir.
Min li felqê qeşayê nerî...
        bi awirên tava hîvê wek gwîzên bû...
Hima hima,
        hima bibêjin wek min bû,
ez jî wek tîrekê direvim
navnîşan di serê min de diçelqin.
Pêşî-
        di nav bexçên pişt malan re,
                ez ê herim ba dêya xwe
                        li Presnya ye.
Bê hemd ez rê digirim nav şîna malbatê.
Berê min li deriyekî di asoyê de ye
        û netewa Rûs hemû
                bi dû min de ye
law bi dû bav de
        keç bi dû dê de
                çend nesîl bi dû hev de.

**Dê û bavên hemû kesan**

-Volodya!
        Tu, êvara Noelê!..
Ev çi bextiyarî ye, kurê min!
Hêwan tarî ye.
        Ode bi elektrîkê ruhnî ye.
Lê ne pirr dereng rûyê malbatê xeyirî.
-Volodya!
        Xwedêyo!
                Çi bû ye?
                        Ev çi li te ye?
Tu bi carekê re sor bûye.
        Ka stûyê te çawa ye.
-Xem nake dayê,
        ez ê bişom.
Êşa tunebûna avê,
        ez aniha nakişînim.
Lê rewş, ne ji ber vê yekê ye.
        Malbata hêja!
                Xoşevîstên min!
Ma ne hûn ji min hez dikin?
        Hûn hez dikin?
                yan na...
Xaltîkê!
        Xuşkino!
                Dayê!
                        guhdar bikin!
Lempên dara Noelê vemirînin!
        Deriyan baş bixilqînin!
Ez ê we bi xwe re bibim...
        Em ê zû ne dereng...
                em ê aniha herin...
Rabin em herin
        em malbat

hemû.
Qet ne tirsin-
ne pirr dûr e-
hew dor 600 verştên bê xêr in.
Heta em çavên xwe bigirin û vekin
em li wir in.
Ew li wir li bendî me ye.
Em ê rast di ser pirê re herin.
-Volodyayê xoşevîst,
ka rawest e,
ev çi maqam e?
Yekê ji a din xerabtir got min.
heta ku min bersiv da wan:
Ma we evîndarî bi çayê daye?
Ma ji bedêla ku hûn ji hev hez bikin
hûn goran pîne dikin?

**Rêwîtî bi dayê re**
Ne tu-
ne dêya min Aleksandra Alekseyevna.
Kaînat hemû bi malbata min re suwar e.
De ka binerin,
stûn di ber hev re
wek xilçan radibin-
Oderê çavî bi Elmanya de teqandiye.
Peya be, dayê,
em aniha li Stettin in.
Û aniha jî dayê,
em li ser rêya Berlînê ne.
Binere bê em çawa difirrin,
li xuşîna baskan guhdar bik dayê!
Wa ye Parîs,
û ahiha jî Emerîka,
Pira Brooklyn.

Erê, û heta bi yekî reşik li Saharayê
        di nav komek reşikên porxelek de
çayê vedixwe û reşika xwe difirkîne.
Wê bi lihêfên ji perîkan,
        azadî bê hilweşandin
                û taht bên qelaştin!
Û we kommunên pêşerojê jî
        bi wan lihêfên bên girtin!
Wê aniha di komîta dabeşkirina
        koxikên malên ku bi sed salan
                ew bi xwe tê de jiyabûn kevin.
Oktoberê
        biqîrîn û birîn
                li wir ceza birrî û çû.
Di bin baskên wê de
        di nav perîkên germ de
we jî ciyê xwe girt,
        û ferfûriyên xwe raxistin.
Porê pîra tevnê bi kopalan nayê şehkirin.
Mala min, warê min
        bi qeşit ji ba min!
Bimîne di xweşiyê de, ez diçim!
Lê teprepa nigên min
        bi dû min de ji ser derencan
                nema tên min.
-Ma wê malbatekê çawa bikarîba
        ev yek bida sekinandin.
Evîna mirîşkan!
        Lewlewa bi mirîşkên kuttanê re!

**Leylana li Presnya**
Di bala hemû kesan de-
        li meydana Kudrînskaya
ez xwe di lezê de dibînim

ji bo ku ez herimm
civanê bi xwe re îro,
diyariyên Noelê di destên min de
barekî ji pakêtên giran e.
Giranî bi dû giraniyê de
êdî ji keştiyê tê avêtin
lê stûnên paçan wek xaçan rakirî ne.
Nalet bibare
li vê sivikbûna xamoş.
Tiştê ku wê bibe warê min
ew tahtên qeraxên bi saw in.
Ne mirov û ne jî gumrik xuya dikin.
Li wê axa bê dar û ber
lodên berfê dişewitin.
Di pacên girtî de
çamên Noelê diçirisin.
Nig diçin, bêyî xwestina wan
li dîwarên bi bircên bilind
û bi rêzên pacan radiwestin.
Di pacan de,
siyên wan fîgurên nîşangehan,
wek ên lîstikên kukla yên balkêş,
di pişt perdan de xuya dikin.
Ew qefilî
awira xwe qut nake ji Neva.
-Gelo ew ê alîkariya min bikin?
Ez li wir hinekî radiwestim
û ji xwe dipirsim!
Tavilê min gav avêtin
ser dikka yekem a baştirîn.
Yekî serxweş xwe li hêwanê
ji xeyalên ji ber alkolê azad dikir.
Hişê wî zû hat serê wî û revî revî çû hundur.
Ji qorziyekê heta a din hêwan dagirt:

-Hirçek,
  hirçek,
      hirçek,
        hir-çe-e-e-e...-

**Mêrê Fyokla Davidovna**
**bi min û temamê nasan re**
Bi dû re,
      wek işareteke pirsê ya badayî
bi çavekî qurmiçî mazûvan derket:
-Heylo!
Ha ev hirçekî bi rastî ye!
      Tu bixêr hatî Mayakovskî!
Û wek ku tu tişt nebûne
      hingiv danî ber min.
-Fermo!
      -Spas xweş!
              Xem nake-
                    ez ê li vir bim.
Wek dema li ba mala Blok bû,
      "çi bextiyariya ji nifşkê ve".
Ez we bi hev bidim naskirin
Pîreka min, Fyokla Davîdovna,
û keça min
çiqasî dişibe min
      ma ne wilo ye-
huvdeh û nîv kirine,
ez we bi hev bidim naskirin.
Û ew ên din...
      Lê, tu berê wan nas dikî?!-
Ji hemû qulên ku wek mişkan sûrrikîbûnê
hevalbend derketin nav nivînan û ser dîwanan.
Bi simbêlên mezin
      wek tîrêjên ruhniya lempan-

hevalên vexwarinê ji bin masê derketin.
Ji sindoqekê jî dilxwaz û xwendevan dinerin.
Ma ez hîna bihejmêrim
rêza wan devjihevan tevî?
Bi rîha wek tevnika pîrê biroqanî
bi aramiya parada dû miriyan, pirtir û pirtir hatin.
Ji sed salan ve li vir bû û hîna jî li vir e
    wek berê-
heger mirov lê nexe,
    nalive, mehîna karên jînê.
Tiştê ku hat guhertin, ji bedêla ruhaniyan ve
nahtoriyekî bi şalê suwariyan dane me,
    li ber hemû kesên din e.
Lê a ji hemû tiştan xerabtir:
    ku bi bejina xwe,
        bi rengê xwe,
û bi kincên xwe, erê
    meşa wî a min bi xwe bû!
Min di yekî ji wan de
    -wek ku em cêwî bûn-
xwe didît û nasdikir-
    ew
    ez bi xwe bûm.
Dema rûyê nivînan daweşandin
    ji nav doşekan
spî derketin rastê û bi lepan silav dan min.
Semawera ku di nav dilopên çayê de mabû,
    bi çembilê kişiyayî dixwest dinyê tevî
        di ber himbêzkirineke biroqonî xe.
Çîçekên wek minminîkan
    li ser kaxetên dîwaran
        ji ber xwe ve dibin tac
            û li serê min dibin.
Horiyên biçûk ên borîzan

wek çaxê şaî û merasiman
pif didan trumpetên bi gepên tûj
li ser ikonostasên xwe.
Îsa mesîh
taca xwe
ji serê xwe hilda
xwe bi dilovanî tewand û silav da.
Marx di nav çarçevên sor de asêkirî bû
ew jî binbarê zimandirêj û qûran bû.
Çûkên qesefê li ser darikên xwe dixwendin,
bi firnikên wan ve **Pelargon** hildikişiyan.
Wek ku bi rastî
li qelavîskan rûniştî
sûretê wan hatibû girtin
pîrên perixî dilgeş xuya dikirin.
Hemûyan silav dan min
û hêdîka beşişîn;
yekê bi dengekî qalin kir pin pin
û yeke din bi dengekî bilindtir :
s prazdnitjkom!
s prazdnitjkom!
s prazdnitjkom!
s prazdnitjkom!
s prazdnitjkom!
s prazd-
nitjkom.
Mazûvên
xwe kuxand
kursî qedimand
û pirtikên nên ji ser fotê pak kirin:
-Wellehî min ev nizanîbû!...
Yan na, min ê ji zû ve...
Bêguman tu ne vala ye, ez dibêm ...
a baştir ku îro...

her kes bi ên xwe re...
li mala xwe...
Ên min ji xwe re?
Haaa ewên han,
ewên entîke.
Gelo pîreke sehr, suwara melkesê jî
karîbû şopa hinên wilo peyde bike?

**Xwestinên bêmane**

Ên min ji xwe re
ên ji Ob
û Jenisey
wê bi dû min de bi kul-kulin
bi çar lepkan bên.
Îcarê ma ka mala min?
Ez berî bi dor saetekê ji wî alî hatim.
Felqakî qeşayê bû
li ber Neva diçû-
tiştê ku mala min e
qeşa bû
di nav pêlan de ser ber jêr bû
û li wir...
min peyvên xweş hilbijartin,
ji peyvên sergirtî eşkeretir
ji giriyekî bi zûrîn bilintir
ji dengê lyrayê pirr xweştir.
Min dev ji xweşiyên din berda
û ketim nav rûmeta nemir,
bi tikakirinê,
bi bergerê,
bi gefan
û bi çêran.
-Ji bo we hemûyan bû...
ji bo we bi xwe bû

hûn ên ku aniha li vir in...
Ji bo numûne,
"Musteriayê".
Helbestvan û tiştên wılo...
Lê a girîng...
Ku bi rastî ji bo we bû min nivîsîbû...
Ez hirçek im, heger mirov wilo bibîne...
Helbestnivîsandin...
wek ku çerm ji bedenê bê kirin!
Mirov bi ahengê xwedî dike-
û mirov ji nifşkê ve xwedî pirç e!...
Mirov bi dû re li ber tifikê ye...
fincanek kahwe...
hilmek cixare...
Tiştekî bêxêr:
deh deqîqan bidin min...
Divê mirov aniha tiştekî bike...
berî ku bibe dereng...
Berî ku ew destûrê bide...
-Bawer neke
ku êdî bêhêvî ye!..
Lê ev rast e...
Divê aniha tiştek bê kirin, bi dû re...
Gava pirtikên nên ji ser fotê pak dikirin
bi ken li dînê helbestan guhdarî dikirin.
Wek ku nok bi ser sênîkan de bi kevin
bi ser eniya wan de
peyv diketin.
Yekî bi awirên wek şeraba sor,
bi kel û girî:
Hi-i-i-inekî laweşte...
hi-i-i-nekî laweşte...
Hel tişt wilo heşan e:
Ma çima dîsa ne ez?

Ez dikarim bîstikeke din
        li ser pirê li ba wî bim.
Ez dizanim bê li ku...
        Li dawiya Kûznetskî most e.
Min berdin!
Ji serê qorziyê
        qîrînek tê:
                -Ew serxweş e!
                        Wî bigirin!
Û îcarê xwarin û şerabin din,
şerab û xwarinin din,
û destek lîstika 66!
Qede bi teoriyê bikeve!
NEP-
        ew piratîk bi xwe ye.
Hinekî tev bide,
        hinek qelî bide helbestvên!
Futûrîst,
        zikê xwe dagir!-
Algûşk bi xetera ku ji ser hev herin
bi xirmîn dicûn û dihêrin.
Gava qedeh hatin dagirtin
        bi pit-pita li ser helbestvaniyê
                bi pirbûna artesîanî
                        peyv hatin gotin.
Piştî ku lep hejandin û xatir xwestin
        spî dîsa vekişiyan ciyên xwe,
                ketin nav doşekan.
Qerêja sedsalan wek kevzê
xwe dîsa girt ser hemû tiştan.
Lê ew bi xwe li wê dûrê ye-
        bi pirê ve bizmarkirî ye.
Bi hesret
        li bendî wî ye:

Wê ne dereng!
Ez ê dîsa bi eniya xwe,
dîsa bi nav xeman de
dakevim bi hêza peyvan.
Ez dîsa
êrîş dikim çar aliyan.
Lê peyv
berî ku bigihin hedefê diçilmisin.

**Tiştekî nedîtî**
Dengê min ê bas hêdî hêdî rawestiya.
Lerza sênîkên vala qediya.
Kaxetên dîwaran,
dîwar bi xwe
mat dibin..
mat in...
Bi wan rengên gewr û mat
wek ku dikin bifetisin û bimirin.
Tabloya Böcklin
ji ser dîwêr dibe,
mezin dibe û fireh dibe,
heta ku Moskova hemû dibe "Girava Miriyan".
Ev pirr ji zû ve bû.
Lê dîsa jî
nû ye.
Û îro tu tişt ne hesantir e ji do!
Li wir
di keştiyê de,
keştîvanek
di nav kefenekî de bêliv e.
Belkî deryayekê,
belkî deştekê-
dengê gazinên wan birrî.
Û li wî aliyê deryayê

darên poppel wek çirayên vemirî
ber bi ezmên ve bejin didin.
De baş e, ne xem e-
ez pê ve hildikişim!
Û ji nifşkê ve
poppel ji rehan ve hildibin,
û bi gavên mezin
dikevin rê.
Notirvanên şevê ne,
mîlîsên me ne
bi gavên xwe bêdengiyê dipîvin.
Karonê spî
zêde dibe
dibe gellekên din
rêza stûnên li ber postê,
ew in.

**Ciyekî revê tune ye**
Bivir di destan de wilo tên dikevin xewnan
hildidin ser eniyên xilmaşan-
û ji nifşkê ve
her tişt wenda dibin ji ber çavan
tenê bivir li pêşberî mirov diçirisin.
Gindorên kuçan wilo dikevin xewnan,
û di nîvê xewna min de
hemû tişt bejin didin,
ha va ye hesreta min,
waye dawiya kuçê,
û li pişt wir
ewa han bi xwe
sebeba hemû tiştan.
Bi destên qorziya kuçê
ku dabûn ber şirîneka pacê
min destek kaxet li hev xistin

û min dînar yek bi yek ji nav derxistin.
Min jiyana xwe hemû li ser pacan da.
Malikek pace aseke dînaran e-
  û ez her wenda dikim.
Hîlebazekî dest sivik
  ji bedêla kaxetan ve
    rewrewk dan min
û bi çirûskên kêfxweşiyê
  keviya kaxetan nîşan kirin.
Di lîstika kaxetên pacan de
  di nav lepên şevan de
    hew rengek tenê
dikare bi bextiyariya birînên ku dane
  rivînên dilgeşiya serketinê bide.
Berê-
  mirov karibû mezin bibe,
mirov karibû bi helbestekê
wek hecîreşkekê
  di pacan re bifirre hunduran.
Lê aniha
  ez li ber dîwarên hêwî
wilo qijilî mame şev û rojan!
Aniha dor hatiye rojên din
  û helbestên din.
Mala min, kevir diqefilînin.
Dengê helbestan nakin.
Mîhraba tirban e,
diheje,
melkes carinan wir dimalije.
Ez di derenceke qefilî,
ji pelxeman şaîk û lewitî re,
  pî xwas, hêdîka hildikşim malê.
Êşa di dil de tu caran namire
her xelekan çêdike û zincîrê dihûne.

Ha wilo bû
Raskolnîkov hatibû
dîsa ber derî
piştî wê kuştina ku kiribû.
Mêvanan dan ser derencan...
Xwe bide alî-
ez bi dîwêr ve dieciqim.
Dikin ku min di hola teng de perçiqînin,
lê wê bîstikê deng hat min-
tingîneke ji têlan bû.
Belkî jî ewa han e hatiye
hima wilo rasthatinî
û li wir rûniştî ye.
Hew ji bo xatirê mêvanan,
ew xelkê giran
li wir maye.
Îcarê tilîkên min
li serê zinarê bêhêvîtiyê
dans dikirin,
bi lîstikxwaziya xwe,
şîna min rezîl kirin.

**Heval**
Û mêvan, ew qirakên han!?
Deriyê reben ji ber wan
sed caran li hêwanê çû û hat.
Klam bi zirrînî,
bi qir-qir û qapanî
ketin nav ricf û dînîtiya alkolê.
Derî,
hinekî,
bi qasî biskekê vekiri bû.
Deng girrik dihat:
"Annuşka-

berxa min a hinark sor!"
Şamborek...
Di firnê de ne...
Kurk...
Alîkariyê dikir...
Bi xwe ji ser milan...
Peyv bi dansa one-step
pûç dibin û diçin
û di maqamê one-step de
bi dû re dîsa deng hatin:
"Çima hûn wilo bextiyar dikenin?"
"Êh!"
Deng dîsa wenda bû...
Careke din gotineke girrik
li wir bejin dabû.
Bi taybetî pêşî ne dihat famkirin.
Gotineke,
(mirov nikare bibêj e pirr xerab bû):
"yekî di dansê de çîma xwe şikandibû.
Me ji xêrê re hinekî zêde kêf kiribû.
Me bi dû re her tişt ji bîra kiribûn."
Erê bavo,
ew qîrîneke nas e.
Dengên nas in:
Ez di ciyê xwe de sar bûm,
şerpeze û lal bûm,
min li gotinan,
li gor qîrînan guhdarî kir:
Erê bavo-
ew bi xwe ne-
û di derheqa min de qise dikin.
Êdî xişt xişt dihat.
Rûpelên nota diqulipandin.
"Hûn qala çîmeke şikestî dikin?

Şaî û xweşî bû!"
Û dîsa qedeh
bilind li hevdû xistin,
li nêzîkî hinarkan çirûskan dan.
Û careke din
bi serxweş:
"Balkêş bû!
Ma gelo rast e, di nêvî re şikestibû?"
"Ez te bêzar dikim, lê wilo bû,
nebûbû du qet,
lê dengê şikestinê bû."
Û dîsa dengê derî,
qir-qir, qîjînî
û dîsa dans hilweşiyan erdê.
Û dîsa kaxetên dîwaran
deştên agirpêketî bûn
di guhan de dengê trampêtan
û keser bi two-step bûn.

**Ne tu bi xwe**

Ez li ber dîwêr im.
Ez, ne ez im.
Xem nake,
heger jiyana min
ji bo ku bibe
sergêjeka dînîtiyê hatibe hêran.
Lê ev nabe,
nikare bibe...
lê dengê wê ye ji hundur tê!
Rojek bû,
na salek bû
min guh nedabûn bargiraniya rojan
heta ku min kiribû ez bi dînîtiyê bifetisim.
Jiyana min bi xwe

bi şîna ramanên hevnikî
di nav çar dîwaran de tije ta bû...
Li min dikir qîrîn:
biryara xwe bide
di pacê re
rast jêra kuçê!
Ez ji ber xetera pacan reviyam,
ez bi evîndarî reviyam.
Rast e, hinekî yekalî ye,
hew bi gavên helbestan bû
di tavên êşên şevan de reva min-
lê mirov çend rêzan lê dike
û bi wan rêzan miriyan radike.
Ez dikarim bi helbestan hez bikim
lê bi nesrê ez lal dibim.
Ma li ku ev ne rast e,
ez gotinekê tenê jî nabînim.
Ka li ku, gava min klam avakir
min bi evîna me re
xaîntî kir?
Çi peyva ku heye li vir
gazîkirin e,
alenîkirin e.
Mirov nikare rêzekê tenê ji klamê derxe.
Ez xurt dibezim jortir
ciyekî bilindtir.
Ez li çavên hedefa xwe
bi mêranî dinerim!
Bi serbilindiya ku çîmên min
divê li ku bin, her li wir in,
ez ê bikim qîrîn:
- Ez komplet im!-
Ez ê bibêjim:
-Binere, delala min,

heta bi dema ku li dijî xerabiyan jî
çavên xwe di girim û devê xwe vedikim
û helbestan ava dikim,
a ku ez jê hez dikim diparêzim,
dema naletê dibarînim
xwe di ser navê te re
di qevêzim.
De ka wer e vir,
ez bersiva vê helbestê dixwazim.
Ez çûm ba hemû kesan û va ez dîsa hatim.
Ji te pê ve, tu xelasiyên din,
tune ne ji bo min.
Rabe ser xwe!
Here ser pirê!
Zû here wir!-
Wek gayê li ber serjêkirinê
gava radiweste li ber mirinê
ez stûyê xwe li ber te radidim.
Ez ê dîsa bi ser xwe bêm,
carê hinekî din.
Bîstikekê ma-
bi dû re bi xwe re bir.

**Şiîr dibezê de ye**
Wê bîstikê,
wê bîstika helî dawî
qîrîneke nedîtî
bi hewar û nalîn hat min.
Bakurê dinyê tevî dikir qîrîn
wek ku berê qet ne kiribû.
Ji lerza ku ketiye hewayê
ji ricfa ku girtiye bê
ez dikarim texmîn bikim-
ku li ser Lyuban e.

Heger mirov li sermayê,
          û li qirçîna derî binere
ez ê texmîn bikim-
          ku li dor hêla Tver e.
Heger ez ji qîrîna dinyê guman bikim-
          pace hemû dihejin-
                    ez texmîn dikim-
                              li Klînê rast bûye.
Bi qîrîna birûskênTofanê
Razumovskoyê xewr dibe.
Û aniha jî
          li ser îstasyona Nîkolaus e.
Nefesek tenê bû,
û derencên di bin min de,
          di nav kefa pêlên Neva de
bi xetera xewrbûnê bi dûr ketin,
                                        çûn.
Tirsê girt can û bedena min,
          mişt e aniha hişê min.
Wek serma ku difîziya
          bi xiroş û bêhntengî
têlên ernan kişandin
heta ku ji hev qetandin,
          biryara xwe da û kir qîrîn:
                    -Raweste!
Ji berî aniha bi heft salan
ji şeşsed verstên ji vir dûr
min xwe kişkişand û ez hatim
ji bo ku ez fermaneke hêsan li te bikim:
          Na!
Ji bo ku ez vê fermanê li te bikim:
          Wilo neke!
          Wilo neke!
                    Ne gotin

                        û ne jî due
êdî feyde nakin.
Ma gelo hêjaye çi-
        ma wê ji bo çi
                ji bo te bi xwe
                        bibe serketin?
Ez ê li bendî bim, heta ku,
        li vê dinya ku evîna lê hatiye talankirin
                li ba qeflên mirovên din...
Ez heft salan li vir rawestiya me,
        ez ê dusedên din jî rawestim,
wek ku ez bizmarkirî me, ez ê her rawestim.
Sal bi dû salan de li ser pirê,
        sedema kenê xelkê,
                reben û şerpeze,
wek xelaskerê evîna li dinyê
ez ê her rawestim.
        Ez ji bo hemû kesan radiwestim.
Ez ê ji bo hemû kesan dîsa ava bikim,
        ez ê ji bo hemû kesan bigirîm.-

**Rotonde**
Bi two-step dîwar hilweşiyan
        bûn sê parî,
bi tona yek ji çaran
        çend sedek ji wan
                hilweşiyan...
Wek extiyarekî
        li meyxaneke ji ên Montmartre
ez dihejim wek berê-
        ev cara sedan e-
                ez li ser masê me.
Mişterî ji zû ve aciz in.
Tiştên ku di nota de hene

ji xwe dizanin:
lê ez ê wan dîsa teme bikim
ji bo ku em bikaribin derkevin rê
û hinekên din xelas bikin.
Xwedî,
wek ku ji bo li min
û serxweşiya min negirin
zû ji wan re eşkere kir:
-Ew ji Rûsyayê ye!-
Pîrek-
spehîbûna goşt û kincan-
dikenin,
min didahfînin.
"Em bi te re nayên.
Ma qey tu nizanî?
Ma tu fam nakî ku em gewende ne."
Lê heger ew çemê ku diçirisand Neva bûya!
Bi jîna salên ku di nav wê kefê de digevizîn
ez çûm ber Seina bi mij û dûman,
ez ji demê derkirî me.
Wilo qijilî,
wilo zewirî,
qeşmerê kenê xelkê,
û birîndar,
ez di ser mîxferên mîlîtarîzmê re
li bûlvarê gazî dikim:
-Herin bin wê ala sor!
Herin pêş!
Di mejiyê mêran re!
Di dilê pîrekan re herin!-
Îro cemse
bi rastî jî
lezê li xwe dikin.
Derên ku em lê bazdidin dikelin!

**Nîvmirî**
Divê êdî ez bêhna xwe vekim.
Îcarê ez ê herim
ba min bi ku ve bibe, wir.
Li wê jêrê çawîşekî baş fêrkirî difîkîne.
Gezikvanên kuçan
ji ser tratuarê
laşekî bi dûr dixin.
Berbang e.
Ez di nav mija qeraxên Seine re
bi lerza siya fîlmê sînemê ketim rê.
Wa ye-
min li lîse dîtibû-
nexşeya Fransayê diçirisand.
Bi piça hêza bîranînên ku mabûn
min berê xwe da rojhilat!
-au revoîr!

**Îstasyona kurte demekê**
Ez rabûm û bi lez çûm-
û bi carekêre rawestiyam
tavilê li ser zemînekê.
Tiştek bi pînên kevne şalê min ê ve bû.
Min bi destan saxtî kir-
şaîk û girover bû.
Gûmeza pîvazeke mezin bû.
Bi çirûskên zêrînî bû.
Di bin gûmezê re zirîna saetan bû.
Reşaya êvarê
li ser qeraxên dîwaran
garnîtura nav diranan bû.
Ez li ser serê Îvan`ê Mezin bûm.
Birca Kremlînê wek rimeke biroqanî bû.
Ruhniya pacên Moskovayê nediçirisandin.

Bextiyarî ev e!
Li dora min dîsa Noel e
bi çaman xemilandî ye.
Çemek li kuçên Kremlînê dixe:
klamek e,
ya jî lehiya dengê êvara Noelê ye.
Ji nav heft giran,
wek ku çemê Terek bi kef û kewar,
li newalên Daryal rabe,
Moskova di nav pêlên dawetan
û şaiyên cejnê de digevizî.
Porê min gij bûye ji hêrsan
wek sîxan rabûye ser xwe.
Ez xwe wek beqekî didim ser hev.
Heger ez santîmekê tenê
bi paş de vekişim
wê sawa êvara Noela kevnar
min dîsa bi paş de bavêje wê jêrê,
kuça Myasnîtskaya.

**Dubarebûna tiştên ku hatine jiyan**
Bi çepilên vekirî
ez li serê bircê
xeçek im,
ez bi dest û lepan
tewşa xwe digirim.
Êvar tarîtir dibû
ez di nav ewran re
ji metrokê dûrtir nabînim.
Hîv derketiye.
Di bin min re
bi çirûskên qeşayê
çiyayê Maşuk xuya ye.
Ez nema karim xwe bigirim,

wek cambazekî dihejim.
Hindik maye min bibînin.
        Ez ê hişê xwe berdim.
Binerin-
        Qafqasya tije dedektîfên Pînkerton e.
Wan ez dîtim û li hev gerandin.
        Şiklê min ez dam destan.
Mirov bi keriyan
        li dor min civiyan
                hemû ji nas û hevalan,
ji çar aliyên kaînatê
ên ku min nasdikirin hatin.
Ji bo merama xwe lezê dikin,
        waye didevanên duello jî hatin.
Rewş her xerabtir dibe-
        Pirça xwe gij dikin
                û diranan diqiriçînin.
Tif destên xwe dikin.
        Bi destên şil,
bi bahoza destên ku radibin û dadikevin
        bi şîmaqên stemkar
bin guhên min sor kirin.
Dikandaran-
        gurzên lepikan ji dikanan,
û pîrekên bi xwedî miska qelp
lepikên xwe rast avêtin nav çavên min,
lepikên sûkê hemû li ber çavên min
        çûn û hatin.
Rojmane,
        kovar,
hûn jî rawestiyane û lew-lewê dikin!
Piştgiriyê bidin tiştên ku li vê dinyê
        bûne ên min,
û rojnamê bi dû rojnamê de...

aniha dest pê bikin
û têr bibin.
Hemû bêbextiyên ku hatin bihîst in!
dîsa bêbextiyan û derewan dikin!
Ez wek janoyê evîndariyê
bikêrnehatî diyar kirim.
Bila qirêja we ji we re be.
Ne xema min e, ez aciz nabim.
Lê ma gelo çima evqase bêbextî
li min dibin!
Ez tenê helbest im,
ez tenê can im.
Lê ji wir dengek tê:
-Na!
Tu neyarê me yê çend sed salan e.
Em berê jî li yekî wek te rast hatibûn-
yekî destvala!
Barûdê bêhn bike,
tu gulle di lûlê de di bînî?
Ber îşlikê xwe veke,
û diyar bike ku tu mêrî!

**Mirina dawî**

Xurttir ji tava reşandinê
û dijwartir brûskên birqê,
û di eynî wextî de brû li hemberî brûyan
ji çar aliyan tiving,
ji çar aliyan yekîne,
ji çi mauzera ku heye,
çi brownînga ku heye,
ji sed gavan,
ji deh gavan,
ji du gavan,
lûle li min rast kirin,

fîşek bi dû fîşekê de berdan min.
Xwe hinekî digirin, ji bo ku bêhna xwe vedin,
lê dîsa dest bi reşandina risês dikin.
Dilê wî ji bo mirinê tije risas bikin!
        Nîşanê bigirin û berdin!
Heta ku lerz hemû bimire berdin!
Ji bo ku em bikaribin bibînin
        ku dawiya her tiştan tê.
Dawiya perpitandinê jî tê!

**Tiştê ku ma**
Kuştin qediya.
        Bi hemû kirinên xwe
                serbilind û dilşa
hêdî hêdî bi paş de vegeriyan.
Lê wek aleke sor bi rengê xwînê
        pariyên helbestvên diçirisandin
li ser birca Kremlînê li ba dibûn.
Û stêrika helbestan li wir
        seranserê şevê diçirisand.
Gava Ursa major dest bi klaman kir
        ji ber mereqdariya dilan
                perda stêrikan hat hildan.
Gelo dixwaze bibe banûya helbestan?
Ursa major
di ser Ararat`ê heyaman re
        di nav tofana Nûh re
ku wê êvarê li ezmên rabû,
bi malbata xwe re ket rê û çû!
Di guvertê de,
        wek astronotê helbestan
ez im li pêyan, birayê wê
û di nav gir-gira kaînatê de
        helbestan dixwînim.

Zû!
Zû!
Zû!
Ber bi fezayê de!
Em nikarin li vir bimînin!
Çiyayên ku bi rojê diçirisin,
dûr in.
Ruhniya rojê
nû bi ser pîstê de dibeşişe.

**Daxwazî ji...**

**(Hevalê hêja, ê Kîmyager:**
**Ji kerema xwe re tu dagir!)**

Êdî keştiyê danî.
Gidî faran pêxîn!
Ev der,
pîst e.
Halo!
Kindirê bidin min!
Û wî çaxî
ez tavilê ji pacê
bi giraniya kevirên li ser milên xwe hisiyam.
Êdî şeva tofanê zuwa ye û rawestiyaye.
Aniha roj e, germ e,
li ber pacê hat pêrgî min.
Hew li ser dinya gurover- serê Klîmanjaro.
Hew di nexşeya Afrîka de- daristanên Kenya.
Dinya reben hemû girêkek girê rût e.
Ez bi xwe ji ber kul û xeman wilo piştqop im
lê dîsa jî ez pirr li ber dinyê ketim.
Wê aniha dinyê
ji can û dil bixwesta

                    vî çiyayê xeman
têxe keleha sênga xwe bêguman.
Wek hirçekî komunîst
          bi zûrrîn û hewaran
ez dixwazim bigirîm bêhedan,
da ji qutubekê heta a din
          li dinyê ji çar aliyan
lav biherike bi germê û keviran.
Bapîrê min bûbû esîlzade demekê ji deman,
lê çermê destên min na şibe ê destnerman.
Belkî jî
ez ê rojan hilfirrînim xwe bi helbestan
bêyî ku ez rojekê tenê jî herim tu karxanan.
Lê ez ê bi nefesa xwe,
          bi lêdana dilê xwe,
                    bi rika xwe,
bi çi teyê porê xwe yê ku heye
          û ji hêrsan rabûye ser xwe,
bi firnikên bêvila xwe,
          bi tîrên awirên xwe
bi diranên xwe,
ku bi qiriçandinê mihiyane,
bi pizrûkên çermê xwe,
          bi hêrsa brûyên xwe,
bi trîlyonan derneyên çermê xwe,
          erê,
          bi hemû derneyên çermê xwe,
buharê,
          havînê,
                    payîzê,
                              zivistanê,
gava ez radizim,
          gava ez şiyar im,
ez ê tu caran qebûl nekim,

û ez ê her gavê nefretê bikim
ji hemû tiştên bêrê.
Ez ê ji hemû tiştên
ku ji koledariya kevnar
bi kotekê li me bûne bar,
wek tovê eşêfê li her deran
ketine nav me,
wek stemkariya rojane
girtine ser me,
heta bi li vir bi xwe
li sîstema civata me
ku ala sor kiriye xemla xwe.
Lê ez ê wê bextiyariya dîtina,
bê çawa ez û hêza ramanên xwe
bi fîşekên we bêdeng dikevin
nedim we.
Ji bo ku hûn bibêjin:
rehma xwedê lê be,
hîna zû ye.
Hûn dikarin
li serê kuçekê rawestin
û min ji paş ve bikujin.
Lê tu d`Anthes wê nikaribin
fîşekên xwe li eniya min rast bikin.
Berî ku tirb bibe para min
ez ê çar caran pîr bibim- çar caran jî ciwan.
Ez li ku jî bimirim,
gava ez klamekê dibêjim
ez ê bimirim.
Li kîjan xirbî ez bikevim,
ez dizanim-
ez hêja me ku li nav wanên
ku di bin ala sor de şehîd ketin,
bêm veşartin.

Lê mirin, mirin e-
        mirov bi çi awayî jî bê kuştin.
Heger mirov hez neke êşeke xerab e,
        û heger mirov newêribe hez bike
                pirr xerabtir e.
Ji hemû kesan re- fîşekek.
Ji hemû kesan re- kêrek.
Lê ma kengî, çi ji bo min?
Di zarotiya xwe de, belkî,
        di serê hemû tiştan de
                ez ê bikaribim
deh rojên xweş peyde bikim.
Lê tiştên ku we dan ên din?
        Min jî karîbû bistînim!
Lê tiştekî min tune ye
        wek ku hûn jî dibînin.
Ma hûn vê yekê fam dikin-
        ev e a xerabtirîn!
Heger ez bawerbûma bi jiyaneke din
        wê çûn û hatin,
                hesan bihata ceribandin.
Destekî li mirov rastkirî
        bes e û gellek e bawer bin,
tilliyek lê bê tewandin,
        wê fîşek şanî mirov bikin
                lezê û rêya jiyana din.
Lê ma ez dikarim çi bikim
        her tiştên ku ketine dilê min
evîndariyeke mezin e
ji bo jiyana li vir e,
lew her tiştên ku min
        ji dil pê bawer dikir
                û hîna jî pê bawer im
                        li vê dinya vir e.

**Bawerî**

Hûn ê hîna gellekî
        li bendî bimînin-
ez bi xwe dawiya leylana ber xwe dibînim.
Ez bi esehî dizanim ku
        heger ku ez bikaribim
                babetekî ahengê li hev bînim
ez dikarim li ser wê xetê
        bazdim nav jiyaneke
                ku ez nû dibînim.
Ez ê ne pirsim-
        bê ma gelo ev jiyan e?
                Ya jî tiştekî din e?
Ji qirdê xerab ku çi detalya ku heye
        ez pirr zelal û eşkere dibînim.
Hewa li hemberî hewayê
        wek kevir li hemberî keviran e,
bêyî ku ji hev bixwin û kevn bibin
bi hemû çirisandina xwe
        ji demekê bejin dide a din-
wext febrîqa xwe nûkirina deman e.
Ha waye kîmyagerekî bêdeng,
                bi eniyeke rût
û bi qermîçonkên mezin,
di serê dewiyandinê de ye.
Ji bo pirtûka xwe-
        "Dinya hemû"-
                navekî dixwaze.
Ma wê sedsala bîstan,
        kê dîsa rakin?
-Ha vaye Mayakovskî...
        Ne mirrûsekî taybetî ye,
helbestvan e, ne pirr spehî ye.-
Ji vî rûpelî pê ve,

ev rûpel bi xwe!
-Bes li hev biqulpînin!
Min dîsa rakin!

**Hêvî**
Dilekî nû têxe bedena min!
Xwîneke nû bide min!
Ramanekê têxe serê min!
Ez li vê dinyê jiyana xwe
ne giham bijîm
û têr hez bikim bi dilê xwe.
Ez du metroyan dirêj bûm.
Lê ma ka bi kêrî çi hat?
Jiyana ku ez jiyam, ji kurmikekî jî dihat.
MIn di ciyekî teng wek ê masiyakî **harengus** de
ji qewlikekî berçavkan qet ne pirr mezintir de
helbest bi perrîkên ji pênûsan pak dikirin.
Û vaye ez jî îro rût û ketî û tenê li vir im.
Tu çi bixwazî ez ê belaş bikim li ba te-
ez ê bimalijim,
ez ê bişom,
ez ê nobedar bim,
tu bê ku ez ê herim
ez ê tiştên wilo hemûyan bikim.
Ez dikarim bibim berdest
bibim navmalî.
Ma gelo li ciyê ku tu lê ye, berdest hene?
-Ez bextiyar bûm-
gava em xwediyên şîneke wilo giran in
heger aniha sedemeke wilo hebe!..
Aniha
ji bo ku hin mirovan bidirrin
ya jî diranan biqirriçînin
ji wan re tenê nêçîr tê eşkere kirin.

Her tişt dikarin bibin-
kuştin, şîndarî
û xemgînî...
De gazî min bike!
Belkî wî çaxî
xeyalperestiya min bikêrhatî be.
Bi metelên ku tu kesan ne dine
û çîrokên helbestvaniya hov
ez ê ji bo we qeşmeriyan bikim.
Demekê ez dildar bûm...
Lê ma çima mirov dê rabe dîsa
li xemgîniya kevn bikole?
Jankêşî ye?
Û bi dû re...
Mirov pê re dijî
û fêr dibe ku nirxekî li janê bike.
Û ez ji heywanan jî hez dikim-
Dibe ku li devera tu lê dijî
babeteke zoo jî hebe?
Ez dikarim li ber wan bim.
Ez ji heywanan hez dikim.
Li vir ez her roj dikarim
cewrikekî rût bibînim-
li ber deriyê firnê ye
li ser rêya min-
ez nakevim tu şikan,
ez amade me ku ji bo wî
kezeba xwe ji nava xwe derxim
û bibêjim,
ha va ye, hevalo,
de bixwe!

**Evîn**
Belkî,

rojekê belkî,
li bexçê heywanan
di ber allén rêzên daran re
ew jî bê-
lew wê jî ji heywanan hez dikir-
dibe ku li parkê derketibe seyranê,
wek di sûretê xwe de,
di refa dolava min de,
dev li ken be.
Bê guman, dê wê jî rakin-
gellekî spehî ye.
Wê sedsala we ya sîhan
tiştên ku dil bêzar dikirin
di ber me re biqewirîne bi keriyan.
Em ê wê demê bê hejmar şevên
ku bi stêrikan diçirisînin
têxin bedêla wan rojên me têr hez nekir,
em ne gihan.
Min dîsa rake
qet nebe
ji bo ku min
wek yekî helbestvan
xwe ji her babet qirêjê azad kir
û li bendî te mam.
Min dîsa rake
qet nebe bi vê sedemê!
Min dîsa rake-
ez dixwazim jiyana xwe tevî bijîm!
Ji bo ku evîn nebe lîstik
ji bo zewacê,
gepa nên,
û şehwetê.
Ji bo ku evîn, ne bixêr
ji nav nivînan derkeve

û di kaînata bê dawî de
seyranê bike.
Ji bo ku roj
nema derkeve
parsa xwarinê,
wilo ji hevdeketî li ser rêyan,
di nav tozê de nemîne.
Ji bo ku
bi gaziya yekem:
-Heval!-
dinya li xwe bifitile û bê guhertin.
Ji bo ku em
ji jiyaneke bi qeyd û zincîran
dîla karên malê azad bibin.
Ji bo ku
ji aniha û pê ve
em wek xuşk û bira bin,
ji bo ku
qet nebe
dinya bibe bavê me
û ax jî dêya me.

*1923*

# Name ji Tatîana Jakovleva re

Ramûsan ji lêvan
ya jî ji destan,
di xiroşa lerza bedenê de
li nêzîkî min
divê wek agirê li welatê min
rivînên agirekî sor
bi gurrîn bidin.
Evîna Parîsî
qet li min nayê:
dêlikekê bigirin,
wê bi hevrêşim
û tentenan bixemilînin;
ez ê zû têkevim xewê
piştî ku min jê re got-
here ciyê xwe!-
ba wê şehweta heywanî
a hûtan.
Hew tu tenê wek min î,
di bejina min de yî,
de ka were tenişta min,
ez dixwazim rû di rû de
di derheqa vê êvara
girîng de
hinekî qise bikim
wek gava mirovek
ji yeke din re dike.
Saet pênc bû
roj gihabû êvarê,
êdî piştî wê,
ew daristana kûr

a mirovan
kerr bû,
ew bajarê ku bi mirovan
wilo dewlemend bû
mir û çû,
êdî hew dengê fîk-fîka Expresa Barselona
a ku bi pêpîka xwe bêrawest e,
tenê tê min.
Li ezmanê reş xeriqî
birûskan
girrîna
şanoyeke ezmanî
li dar xistin e-
tiştê ku dike bibe
ne ku wê
birq bikeve.
Ev hemû dilxerabî ye
dike ku çiyayekî bibe ciyekî din.
Ez ji cewherê peyvên pûç
bawer nakim,
ji destên min ên lerzok netirs-
wan adetên ku min
ji bapîren esîlzade girtine,
ez sozê didim
ku ez ê lixavên wan ragirim
û ez ê wan kedî bikim.
Ew sorikên ji ber kul û xeman,
wê wek qejmûşkan biweşin
wê hew dilgeşî tenê nemir be
û demeke dirêj
bibin sedema ku ez
di helbestan de
qala evîna me bikim.
Dilxerabî,

jin,
giri,
û cirnexweşiyên wilo xelas!-
çav dinepişin
dibin wek ên efsûnkerê
di pirtûkên Gogol de.
Ne ji bo xwe tenê
ez dilxerab im,
çavnebar im,
ev li ser navê Rûsya Sovyetî tevî ye.
Min dît ku êşa zirav
mirovên belengaz
û zendik bipîne qirr kirin.
Lê heger
bi sed milyonan mirov
di xizaniyê de dijîn
tawanbarî ne a me ye.
Em dikin
ku alîkariyê bikin
bi qasî em dikarin-
lê piştin xûz hene
ku bi werzişê rast nabin-
li welatê min îro hewcedarî
bi ên wek te heye,
li wir
ew babet mirovên me
ên wek te çîm dirêj
ne pirr in.
Tu
a ku di nav bagera berfê
û tîfo re
bi wan çîmên wilo dirêj
gellek caran çûye
û hatiye,

pêwîst e tu nehêlî ew
li bar û qulûbên şevan
bi destên mîrên petrolê
bên firkandin.
Vêna ji hişê xwe bavêj.
Çavên te bi rivînên êgir in,
û gava tu dikenî
kevanên birûyan
wek xetan rast dibin.
Were vê derê,
lepên min ên mezin
dirêjî te bûne.
Tu naxwazî?
Baş e,
çile jî li vî bajarî derbasbike-
lê bila ev riswabûn
ji hesabê min û te herduyan be.
Çawa be
ez ê rojekê bêm
û te bibim,
tenê,
ya jî Parîsê bi te re.

*1928*

# Xatirxwestin

Tirimpêl çû.
Û franca min a dawî
hat xerckirin.
-Ma wê kengî trênek
rabe Marseille?
Parîs bi min re tê
ji bîra min naçe,
warê ku ez wilo fêrî wî bûbûm
hiştina wî ne gengaz e.
Dilê min ê zîz û nazdar
dike ku bifetise
û çavên min şil in
di xatirxwestinê de.
Li Parîsê
mirov dikare
him bijî
him jî bimire
heger ku axeke din tunebûya
*-Moskova.*

*Cara yekem,*
*di kovara Parizjskij Vestnik de*
*1925 di No. 25-an de çap bûye.*

# Heta deng hebe qîrîn

Hevalên hêja
ên çaxên wê bên!
Gava hûn
li nav gûyê hişk
ê ji dema me bigerin
û li ser tarîbûna dema me
lêkolînan bikin,
belkî hûn ê
pirsa min jî bikin.
Û belkî,
wê pîrekî lîteratûrê
di pişt dîwarên zanistiyê de veketî,
ji tava pirsên we re,
bibêje: erê welleh
helbestvanek hebû
gava klam digotin,
wek agirê sor bû,
loma jî navê wî
neyarê ava sar
ê yekem bû.
Gelo profesor
dikare ji kerema xwe re
duçerxa berçavka xwe derxe!
Lew di derheqa xwe
û wê demê de
ez dikarim bersivan bidim.
Ez karkerekî pakirinê bûm
endamekî Partiyê yê dilêr bûm
û dema palûta şoreşê rabû
ez jî mobîlîze bûm,
ez ji gulîstana xaltî helbestas
ku moda dawîn bû

di nigê nigdande çûm eniya şerî.
Ew gulîstan,
        ... hûn dizanin:
Ew derxên dilovan hemû:
        Dil,
        êş û kul,
        çavên şil,
        westan û rastî,
        rûmet û evîndarî...
Ax, gulîstana min-
        çi renga-reng bû!
Îro yek rabûye,
çi tê ber devê wî
wek ku avê ji misîn birijîne
dike klam û dibêje,
yekî din devê xwe ji gotinan dagirtiye,
        û helbestan dipijiqîne-
Mîtreşkîn e yek ji wan,
li ser eniyê temberî xelek e,
        û Kudreçko jî
xeta rastikê di navê re ye-
        şeytan dizane navê hemûyan çi ye!
Gelo ji bo belengaziyê karantîna tuneye?
Na-
di dîwêr re deng tê ku mandolîntiyê dikin:
"Tara-tî, tara-tam, tara-tî,
tara-tey..."
Piçek rûmet e
        dema di nav ên wilo de
helbestên min wek abîdan
        li meydanê,
li wê devera ku mirov di nav qahbikan,
        qewadiyê û frengiyê de,
                êşa zirav dikuxin,
                        bejin didin.

Helbest wek êgir bû
di devê min de bû
bawer bin min jî karîbû
romansan bi ser hevdû vekim
û wê spehîbûna ku serketineke navdar
û di bêrîkan de rublên pirr
didin mirov biçînim.
Lê min
sozeke din da,
û min bi xwe
pêl stûyê klama xwe kir.
Hevalên pêşerojê
guhdarî bikin-
vaye ê ajîtator
qise dike,
ê ku sûlava tava lewlewa lîrîkê girtiye,
mîkrofona serek bi xwe ye.
Ez di ser albûma helbestvaniyê re
bi gavên mezin dikevim hunduran.
Ez wilo qise dikim, wek ku yekî jîndar
ji yekî din ê tije jiyan re qise dike.
Di demeke komunîzmê a dûr de,
ez ê bêm ba we
lê ne wek helbestvanekî suwar û çekdar,
yekpare Yesenînbûyî.
Wê helbestên min
di nav heyamên asê re
û di ser serê helbestvanan
û hukûmetan re bigihin we.
Wê helbestên min bigihin we,
lê ne bi lew-lewa helbestvaniyê-
ne wek tîreke sist
ji nermiya têlên lurayê,
û ne wek pênc kopekên kevn
ji bo yekî entîkevan

ya jî wek ruhniya ji stêrkên vemirî.
Wê helbestên min
bi xîret di nav heyaman re
xwe bigihînin pêş,
wê giran
hişk
û girîng bin,
wek coyeke avê
di dema me de
ku hîna koleyên Romayî
bi xwe ava kiribin.
Di goristana lodên pirtûkan de
li wê dera ku helbest veşartîne
hûnê li çend rêzên ku hîna jî
wek pola diçirisînin rast bên-
bi hemd û hêdîka
rahijin wan;
erê, rast e, kevn in
lê hîna gefok in.
Peyvên min
fêrî xweşkirinê
û şelafiyê nebûne,
û ez di guhên tu keçikên porxelek de
tiştên nîv bê rê nakim pist-pist.
Min bendên xwe
wek leşkerên di merasimê de kirine rêzê
û ez di ber wan re derbas dibim
wan teftîş dikim.
Helbestên min
rêz bi dû rêzê de
bi giraniya risês rawestiyane,
ji mirinê re amade ne,
ya jî, ji rûmeta serketinê re.
Helbest stewiyane û mane,
navên helbestên min hemû

di çaviyan de li tenişta hevdû
bi qîrîn nav di xwe didin
û nîşanê digirin.
Ew in çekên min ên xoşevîst,
amade ne
heger ez bibêjim
ew ê êrîş bikin;
hevdengî û aheng
wek rimên tûjkirî bilind in,
suwariyên mifreza çelengbûna min
baldar rawestiyane.
Û ez wan yekînan,
ku min ji serî heta binî
bi çek kirin,
ev bîst sal in her serketî
bi pêş ve çûne,
gelî proleterên cîhanê
îcarê ez hemûyan,
heta bi rûpelê dawî
bi dilekî germ û şa,
diyarî we dikim.
Ewên ku neyarên çîna karkir in
ji sedsalan ve
neyêrên min in jî.
Em di bin alên sor de
ji destê rojên birçîbûnê
û ketina dûrî aqilan
bi komê mezin dimeşiyan.
Cildên Marx yek bi yek
me vekirin û vekirin,
wek dema mirov li malê
pacên xwe vedike,
bêyî ku em bixwînin
me bi esehî zanîbû
bê em li kîjan rûpelî mabûn

û bê kî hevalbendên me bûn.
Ne Hegel bû ê ku em
fêrî diyalektîkê kiribûn,
bi gûrîn ketibû nav helbestên me
wî çaxê ku serdest
jı ber tava fîşekên me direviyan,
wek ku demekê
em ji ber wan direviyan.
Bila rûmet
wek jinbiyeke bêhedan
serberdayî be
di şîna meşên cenazan de
bi dû mêrên navdarde be-
wê helbestên min
di serê êrîşê de bimirin,
wek ku hemû neferên bênav
li ber kozikên dijmin dikevin!
Gû têkeve mefreqê giranbuha
û mermerisma çaplûs!
Em ê rûmetê li hevdû par vebikin-
ji xwe em yek celeb in-
û abîda me ya hevbeş
bêguman wê bibe
ew tekoşîna serketî
sosyalîzm.
Gelî ên pêşerojê
mirovên rehet,
aram û zînde
şewkên xwe bavêjin ferhengê:
ji çemê Lethes
peyvên ku hîna mane:
"ambargo",
"fuhûş",
û "tbc"
wek masiyan bigirin.

Bawer bin ji bo we bû
min rebenê helbestvan,
bi zimanê banderolan
pelxemên tbc
alastin.
Ez bi terriya xwe ya ji salan
bûme wek fosîleke terriyan,
a cenawirekî ji heyaman.
Hevala jiyan,
bihêl em hinekî bi rê bikevin
tiştê ku ji pîlanê pênc salan maye
em bi gavên mezin tê re derbasbin.
Bawer bin,
piştî van helbestan hemûyan
ez wek sipiyekê rût û xizan im
û xweşiya li ser mobîlyayên bedew
li maleke wilo raxistî
ez hîna jî nizanim.
Lê bêyî,
ez bi rastî bibêjim
îşlikekî ku nû hatiye şuştîn
ez ne hewcedarê tu tiştan im.
Di pêşeroja ruhnîtir û geştir de,
bê guman ez ê derkevim
pêşberî Komîta rêvebir,
û ez ê di ser serê komên
sextekarên helbestan re
her sed cildên xwe
ên Nivîsên Civandî
ku bi partiyê re dilsozin,
wek qerteke partiya Bolşevîk
bilind bikim.

*Çıleyê 1929-1930*

## Notên dawî

### Qutikê Tewtewan

Helbesteke ku dema turneya futurîstan dixwend e. Navê wê, ji qutikê wî bi xwe tê. Xet û rengên zer tê de hebûn, silkên biçûk ji bedêla qumçokan ve bûn û li ser rûyê wî jî sûretê teyaran, kûçikan û işaretên cihûyan ên kevn hebûn. Hevalên wî jî kêm zêde wilo bûn. Bi vî awayî kevneperestî protesto dikirin.

- *Nevskiy-* kuçeke dikandariyê ya dewlemend li Petrogradê bû.
- *r: yê biixînim-* derxistina dengê tîpa - r: yê wek dengê - x: ya Kurdî, ya jî ğ: ya Tirkî. Wek ku Fransî lê dikin.

### Ewrekî bi şal

- *Nîzza*: navê bajarê Nice ê bi Îtalî ye.
- *La Gioconda*: Tabloya Mona Lîsa a ku Leonardo da Vincî çêkiriye. 1911- an li Parîsê, ji Musée du Louvren hat dizîn.
- *Golgata*: Ciyê ku Îsa lê hat çarmixkirin e.
- *Çokolata Von Hauten vexwin*: Wî çaxî, yekî ku dê bihata idamkirin, wê berî mirina xwe bikira qîrîn û wilo bigota. Wê firma Von Hauten perakî mezin ji bo wê kirina wî bida malbata wî.
- *Imbecilla*: navê nexweşiyeke psîkolojîk e.
- *Lepra bacill-* Nexweşiyek e. Dest û tilî kurmî dibin.
- *Autodafé-* ciyê ku berê li Ewrûpayê cadi lê dişewitandin.
- *General Gallifet, Gasten de Gallifet*: Generalekî ku dijî Komuna Parîsê şer kiriye û gellek xwîn rijandiye.
- *Îskarîot, Yudas Îskarîot-* şagirtê Îsa, yê ku pê re xaîn ket.
- *Krupp*: Navê şîrketeke Almanî a çek e.
- *Pompej*: Bajarekî Romayan ê li quntara çiyayê Vesuvius bû. 24- ê tebaxa 79- an berî Îsa, gava Vesuvius teqiya, di bin kevir û 6- 7 metro ariya germ de ma. Li gor texmînê, di bîstikekê de dor deh hezar mirov mirin.
- *Mamay*. Hordens Han Mamayê Mogol.
- *Lusitania*: Keştiyeke Brîtanî a rêwiyan a 31 500 ton bû. 5 gulan 1915- an bi torpêdên Almanya ên keştiyên binav, hat xewrkirin. Ji 1956 kesên ku tê de bûn, 1198 mirin.

- *Rotschilld*, **dibe ku** Natham Mayer Rotschild be- dewlemendekî cihû yê Alman bû. Li gellek ciyan bankêrtî dikir. - ez dibe dibêjim, lew siyasetvanekî Brîtanî jî bi wî navî di heye. Lê bi guman, ê din e.
- *Borşç*: navê şorbeyeke Rûsan e. Ji silkesoran tê çêkirin.
- *Mefîstofeles:* Navê şeytanê Goethe ye.
- *Faust*: Navê pirtûk û Fîlozofê Goethe ye.
- *Azef*: Ajanekî du alî ê wê demê bû.
- *Madonna*: Navê dêya Îsa Meyrem ê din e.
- *Marseillaise:* Navê marşa Fransiyan a netewî.
- *Barabbas*: keleşekî ku Cihû dibirin ser Îsa.
- *Herodes*: Mîrekî Cihûyan bû. Yahya bi kuştan da.
- *Kuça Presnya*: Mala ku Mayakovskî bi xuşk û dêya xwe re lê dima.
- *Tiana*: Pîreka ku Îgor Severyanîn helbest jê re nivîsîne.
- *Kî- Ka- Poo*: Şiklekî dansa wî çaxî ye.
- *Brahsema:* bi Germaniya kevn e, bi Fransiya kevn Bresme, bi Fransî Bréme û bi Îngîlîzî Bream e. Babetekî masî ji familya karp ku di çeman de dijî ye. Pişt û teriya wî bilind e, lê wekî din pan e.

## Lîlî can

Helbest 1916 de hatiye nivîsîn, piştî mirina wî bi çar salan (1934) li ser salnameya ku ji bo giramiya wî hatibû amadekirin (Bi Mayakovskî re) hatiye weşandin. Ne kifş e bê çima ev helbest 14 salan ne neweşandî hiştiye.
- *Doja Krûçyonîş*- Destana A.J. Krûçyonîş û V.V. Çlebnîkov a bi navê *Leystik di Dojê de* tîne bîra mirov.

## Li ser wilo

Cara yekem 1923- an di kovara LEF hejmara yekem de hat weşandin.
- *Kazbék*- çiyayekî li Kafkasyayê ye.
- *Ew şeş niqtên li dawiya destpêkê*, ji bedêla peyva *evîn* bi Rûsî ve ne.
- *Klama li ser zîndana Readingê*- Navê helbesteke Oscar Wilde ye
- *Passaja Lûbîanka*- Navê kuça ku mala Mayakovskî lê bû.
- *Kuça Vodopyanîj*- Navê kuça ku mala Lîlî Brîk lê bû.
- *Myasnîtskaya*- navê kuçekê dikanan li Moskovayê bû. Kuça Lubyanka û kuça Vodopyanij bi hev ve girêdida.
- *67- 10*: hejmara telefona Lili Brik a bi rastî bû.
- *Cêrî*- navmaliya Lîlî Brîk bû. Navê wê Annuşka bû.

- *d'Anthes-* navê didevanê A. Pûşkin ê duelloyê ye. Bi eslê xwe Fransî bû û sala 1836- an, Pûşkîn di duelloyê de kuştibû.

- *Balşîn-* "cîranê" Mayakovskî bû. A rastî, xwediyê xaniyê wî bû.

"- *Mirovekî ji berî 7 salan"-* li vir qala helbesta xwe ya ku navê wê Mirov e dike. *Mirov,* sibata 1918 an derket û tam pênc salan berî *Li ser Wılo* ye. "Ev heft sal in ku ez lı vir im... heft salan beyî ku av awira xwe ji min qut bike". Di nushayeke yekemîn a *Lı ser wılo* de, "ev pênc salin ez li vir im" û a dîrokî a rast jî ev e. Loma jî ne eşkere ye bê bi "heft salan" çi qesd dike. Tê gotin ku heft salên lı benda manê yên di dûmahiya pirtûka Dostoyevskî Sûc û Ceze de bi bîr tîne: "Divabû qewîn bûna û li bende bimana. Hîna heft sal li pêşiya wan hebûn..." Divê neyê ji bîrakirin ku wekheviyên vê helbesta Mayakovskî û pirtûka Dostoyevskî, bi gellek awan hene.

- *Êvara Noelê-* tê gotin ku ev sernav ji çîrokeke N. Gogol girtiye.

- *Parka Peter û Parka Şodînka-* du park lı Moskovayê ne.

- *Kuça Tver-* navê kuçeke li nava Moskova ye. Bi dû re bûye Kuça Gorkî.

- *Meydana Kudrîn-* li Moskovayê ye, navê bı dû re wê bûye meydana serhildanê.

- "*Nahtorî"-* Li gor qanûna ku divabû pirtir mırov di xaniyan de bijîn, kesên ku xaniyên wan hebûn, divabû endamekî Partiya Komunîst qabûlî mala xwe bikin. Wê demê endamên Partiyê şalê siwariyan li xwe dikirin.

- *s prazdnitjkom-* bi rûsî ye, dıbêjın ku tê mana, cejna te pîroz be, fermo.

- *Ob û Jenîse-* Navê du çeman li Asya navîn in.

- *Musterîa-* Lîstika Nepen, navê şanoya ku bi sedema yek saliya şoreşê nivîsî bû ye. Di nav salên 1918 û 1921 de li gellek bajaran hat lîstin.

*Kuznetskî Most-* navê kuçeke li Moskovayê ye, tê maneya Pira Kuznestkî.

- *66-* lîstikeke kaxetan e. Mayakovskî bi xwe pirr ji wê lîstikê hez dikir û di lîst.

- *Girava Miriyan-* li vir navê tabloyeke hunermendê Swîsrî Arnold Böcklin e. Di nav salên 1827- 1901 de jiya ye. Kopiya wê tabloyê li Rûsya navdar bû.

- *Karon-* (Charon) di mîtologiya Yunanî de, keştiyevanê xweda Hades e. Hades xwedayê mirinê û binaxê ye, lawê Rhea û Kronos e, birê

Zeus û Poseidon e û mêrê Persefone - li gor mîtologiyê navê welatê mirinê jî Persefone- e.

- *Raskolnikov-* di Sûc û Ceze de heye.

- *One- step, Two- step*: Navên du awayên babetekî dansê ne.

- *Lyuban, Tver, Klin, Razumovskoye-* bajarên nabêra Petrogradê û Moskovayê ne.

- *Îtasyona Nikolaus,* li Moskovayê ye, bi dû re bûye Îstasyona Leningrad.

- *Montmartre-* di rastiyê de La Rotonde li Montparnasse e û wê demê ciyêkî ku nivîskar û wênevan lê diciviyan bû.

- *Ivanê Mezin,* birca saetê a bilintirîn a li Kremlîn e.


- *Geliyê Daryal, Çemê Terek* - li Gurcîstanê li nêzîkî Tîflîsê ne.

- *Çiyayê Maşûk,* li bakurê kafkasyayê ye.

- *Pînkerton,* Allan Pînkerton: 1819- 84- an dedektîfekî Emerîkanî ê li Chikago.

- *Yekî destvala-* qala helbetvan Michail Lermantov (1814- 1841) dike. Pirr li ber kuştina Pûşkîn ketiye, li ser kuştina wî xeyidiye, helbest nivîsiye û nefî kafkasyayê bûye. Lê ew bi xwe jî li quntara çiyayê Maşûk di duelloyê de hat kuştin.

- *Ursa major-* Navê komeke stêrikan ê bi latînî ye. Heft stêrkên ruhnîtirîn ên ji komikê ne. 'Ursa' wek gotin, tê mana hirça mê, 'major' jî tê mana mezin. Ev nav di astronomiya nav neteweyî de tê bikar anîn. Ursa major li gor dinyê, li bakurê ezmên e. Li welatê me êvaran zû xweş xuya dikin. Ji bo vê koma stêrikan ez bi Kurdî li tu navên ku bişibin rastiyê, rast nehatim. Loma jî min navê latînî hilbijart. Hin nevên ku li hin herêman tên gotin hene: Termê Mextel. Termê ... Lê dişibe navekî bi erebî û dereng lêkirî. Lê li deverin herêma DêrikaÇiyayê Mazî, Hirçê tê gotin. Ev nav, nêzîkî rastiyê ye. Şiklekî wilo ye:



*"Cewrikekî rût... li ber firnê"-* ev ji rastiya jiyanê tê. Hevalê Mayakovskî Lîv Grinkrug di bîranînên xwe de wilo dinivîsîne: "Li kuça Vodopyanîj, kuça ku malbata Brîk lê dijiya, cewrikekî rût, bêzar û nexweş deme-

ke dirêj li ber firnê dima, hebû. Mayakovskî, her roj bi xwarina ku ji malê bi xwe re dibir, ew xwedî dikir. Ew cewrikê ku di helbesta Li ser wilo de, wilo bi dilovanî li ser dinivîse ew cewrik bû."

*Harengus*- Navê masiyekî bi latînî ye. Min navê bi Kurdî pêda nekir, loma jî ez li navê latînî geriyam. Bi Swêdî sill e. Bi Tirk Ringa Balığı ye.

## Heta deng hebe qîrîn

Çileya pêşîn a 1929- an û û çileya paşîn a 1930- î nivîsiye. Helbesta wî a dawî a ave ye. Tê gotin ku wek destpêka helbesteke dirêj hatibû nivîsîn. Lê negiha ku xelas bike. Gava ku jûbîla xwe ya 20 saliya nivîskariya YÛVLAM vekir, ev helbest ji kaxetê ji mêvanan re xwendibû.

Ji ber şaşiyeke mîzanpajê *Klama li ser zîndana Readîngê* ku berdewama şiîra *Li ser wilo* ye, mîna şiîreke serbixwe hatiye weşandin. Em rast dikin û ji xwendevanan lêborînê dixwazin.

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ **Celadet Alî Bedir-Xan** / Gramer
- DÊ Û DÊMARÎ **Egîdê Xudo** / Roman
- KESKESOR **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN **Rohat** / Lêkolîn
- HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ **Mehmed Uzun** / Ceribandin
- MÎRZA MEHEMED **Medenî Ferho** / Roman
- MILKÊ EVÎNÊ **Rojen Barnas** / Şiîr
- ZAROKA ŞEVÊ **Jack London** Werger: **Mustafa Aydogan** / Çîrok
- BIYANÎ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Husên** / Roman
- MÎRZAYÊ BIÇÛK **A. de Saint-Eksupéry** Werger: **Fawaz Husên** / Çîrok
- GOTIN **Yaşar Kaya** / Ceribandin
- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR **Xelîl Duhokî**
- ŞEVÊN SPÎ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Ceweri** / Roman
- MIŞK Û MIROV **John Steinbeck** Werger: **Firat Ceweri** / Roman
- BEXÇEYÊ VÎŞNE **Çexov** Werger **Firat Ceweri** / Piyes
- LI BENDA GODOT **Samuel Becket** Werger: **Firat Ceweri** / Piyes

- GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforîsma
- GIRTÎ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KEVOKA SPÎ **Firat Cewerî** / Çîrok
- KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT **Firat Cewerî** / Ceribandin, hevpeyvîn
- XEZAL **Sîma Semend** / Çîrok
- EVÎNA REBEN **Derwêş M. Ferho** / Şiîr
- BANGA HAWARÊ **Medenî Ferho** / Şiîr
- KULTUR Û RAMAN **Şerefxan Cizîrî** / Ceribandin
- KURÊ ZINARÊ SERBILIND **Sidqî Hirorî** / Roman
- ŞIÎRÊN BIJARTE **Mayakovskî** Werger: **Süleyman Demir** Şiîr
- PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ **Mustafa Aydogan**